



BONIYE- Cegerxwîn ...

Rûgeşa min

Rûgeşa min xeyidiye
Çûye dûr
Nema guh didî ew
Li vê nalînê
Bi sala ye dilê min dikî
Gazî
Dibêjî vegere, bese
Şêrinê
Ji çûna wê ve, ez mame
Birîndar
Zîvarî û şikestîme
Li jînê
Bi vîna wê re, ez
Bûme evîndar
Bê wê çibikim
ji nûve ji hêvînê
Heza min jêre bû timî
Bê hawe
Gunehî min nekiriye
Bo nûjînê

Bi hawarî derûnê min
Dîqêrî
Da zû bibînê rêça
Nazelînê
Ka demeke dî yarê tu
Bide min
Binêre ez çî rêbazê
li jînê
Nehêle dilê min timî
Binalî
Birîna min gelekî kûre
Zînê
Perîşanî belengazî
Para min
Evîna me çawa wê
Xwe vejînê
Ka vê carê jî em
bib'ne
Rûpîroz
Wekate, ezê bême
Şaneşînê



Bide min
Binêre ez çî rêbazê
li jînê
Nehêle dilê min timî
Binalî
Birîna min gelekî kûre
Zînê
Perîşanî belengazî
Para min
Evîna me çawa wê
Xwe vejînê
Ka vê carê jî em
bib'ne
Rûpîroz
Wekate, ezê bême
Şaneşînê

Hevpeyvîn bi **Abdulrehman Çelik** re

Hevpeyvîn: **Dilşa Yûsûf**

Dezgeha Şanoya Seyrî-Mesel

Di şopa resenatiya kurdewarî de

Dezgeha şanoyê ya bi navê Seyrî-Mesel, li zikakekê nêzik cada Teqşîm ya binav û deng, ku wek dilê Stenbolê ye dijene tê nasîn, li Stenbolê bi cih dibe. Ev çend salin vê dezgehê xabateke giring di warê şanoya Kurdî de pêşkêşkirîye.



Dezgeha şanoyê ya Seyrî mesel ji bê derfetî û destkurtiyê ji hêla maddî ve, bi kedek resen li dûrî welat hatiye afirandin. **Rûpel (14)**

Ji zargotina kurdan

Daweta kunda

Danheva: **Dilovan çetê**



Dema mîr ev gotin bihîst destê xwe hilda û got rawestin. Piştî kundê milê rastê gotinê xwe bi dawî kirin mîr ji wî zilamê xwe pirsî van kunda çî gotin?

Zilam got mîrê min xwiyaye ev kundê milê rastê hatine ser cila kundê milê çepê û dixwazin yekê bixwazin!!

Mîr got ma evê dî çî dibêjin, bû qide qida refê dî. zilam got ew dibêjin win ser çawa hatine, refê milê rastê gotin ji kerema xwe re ji me re bêjin nexta (qelen) bûka me çiyê?

Refê rexê bûkê gotin qelenê wê çil gundê xerabene. Mîr bilez got guhê xwe bide wan bê wê çî bêjin.

Kundê rexê zavê gotin me qebûl kir, lê malbata bûkê gotin çawa winê karibin çil gundê xerabe peydakin?

Yekî ji refê zavê bankir û got saya xwedê û serê mîr eger we çil xwestiye em karin bîncî û zêdetirî wilo qelenê bûka xwe bidin!!?

Mîr matmayî ma û got : gelo meqseda va kunda kiye ?

Zilam got mîrê min ev gotin tev li ser teye !! li vir mîr bi tepa bi serê xwe ket û got hetanî bi kunda dizanin ku ez xerabiyê divî welatî de dikim, lê ez soz didim ji xwedanê mezin re ji îro pêve ez zilm û zorê li tu kesî nema bikim û ezê hewl bidim gund û deverê xerabe ava bikim.

Mîr bang kir wezîrê xwe û got:

di vî welatî de çî heye çî nîne , gelo milletê min ji min razî ye ? li ser min çî dibêjin, lê berî tu bersivê bidî ez dizanim tê çî bêjî.

Min tu carî ne bihîztiye rojekê kesekî ne razîbûna xwe daye xwiyani kirin û ez bawerim tu kes birçî namîne ji ber ez bixwe zanim bê çiqasî xêr heye mîna xêr û xweşiya li qesra min.

Pepûkê wezîr dixwest ji mîr re rastiya ku bi çavê xwe dibînê bêjê lê Mirovek di bajêr de hebû pir zengîn û maldar bû, ew bixwe bazirganekî pir mezin bû, rojekê xwarina mîr û zilamên wî çêkir.

Mîr çend siwar û çend zilamê xwe dane pey xwe û berê xwe dane mala bazirgan....Bi rêde gihane gundekî xerabe, riya wan di nava gundan re derbas dibû, li milê rastî wan refekî kunda li ser xaniyekî xerabe danîbû û li milê çepê jî refekî dî hebû. Mîr û kesê pîre gihîştine hemberî kunda, dengê kundê milê rastê hate wan, zilamek ji zilamê mîr got ji kerema xwe re hinekî rawestin ez ji van kunda fêhm dikim (ez bi zimanê wan dizanim) .!!

Ava Mezin (Dicle)

Dicle yek ji herdu çemên mezin yên Kurdistanê ye. Çemê din Firat e. Dicle ji Bakurê Kurdistanê dest pê dike û li Kendavê digihe deryayê.

Nav û wateya Dicleyê

Di serdema kevn de ereban ji çemê Dicleyê re *Dijla*, faris û kurdan *Tigra*, rûsan *Tir* û yewnaniyan jî *Tigris* gotine. Îro jî hemû ewropî ji çemê Dicleyê re, *Tigris* dibêjin. Koka gotinê yek e lêbelê her gelî li gor zimanê xwe bilêv kiriye. Gotina Dicleyê xerabkirina *Tigra* ye. Lêvkirina Dicleya îroyîn nêzîkî bilêvkirina erebî ye. Wateya *Tigra* "bi tîj û hêz diherike û mezin e". Ji xwe botî, cizîrî, mêrdînî û heta li hindek deverên Başûr hîn îro jî ji Dicleyê re dibêjin *Ava Mezin* an *Çemê Mezin*..... **Rû(4)**



Çîroka Kêza Terecan

Danhev û amadekirin: **Kemal Tolan**

Cewahirên Kurdî yên ku hîna ji nav zargotina Ezdahiyên ne hatine tomarkirin-2

Çîrokên me şahdetiya kevnariya mîtolojiya Ezdahîtiya me dikin

Pêşgotin

Bi dîtina min, şahdê dîroka kevn ne tenê di şer, ceng, peyman, hevdtin, desthilatdariya qiral, mîr, padîşah, siltan, egît, fêriz, beg û serok eşîran de anjî di wan delîl û dokumentên ji ber dîtina piraniya zane,..... **Rûpel (11)**



Bêkes Têlo

EM HÊJÎ NE HÊJAN E BIBIN NETEW E!



Ji Cegerxwîn bigre ta ew kesê ku duwa roj, ji berhemdêran ew ê ji nav me barbîke. Her nûçeya koçkirina danêrek an jî, hunermendekî me dighê min, ez hêrs dibim .Ez hes dibim ku xwîna min bi xurtî diherike, wêne bi dûv wêneyeke dî ji nerazîbûnê ku di kolanê de xwe pêşandan dike. Qêrîna ne heqiyê xwe ser giyanê min radide, ji wan rêber û berpirsyaran ku dawazî û pist-pista heyvê nakin û sîbera nêrînên wan nemiran bi ti hawî ne dibîsin û ne jî, guhdar dikin.

Bihîstina weke van nûçeyan, li derveyî pencera min, roj bi min can bi hin henasan û xewnên nepêkhatî can dide. Her xewneke me can dide ji ezitiya wan a reş, ku bi xwe daketine. Ew ezitiya wan, me angel dike bo her azadiyek, hergava jiyana me dixwazin weke dengê wan be. Xweska vê care qîr qîra min bighê wan, deku em bi hev re qîr qîra mirinê daliqînin

Dibe nêrîneke ne rast be, ne di cihê xwe de be , roja navnetewî a pirtûkê bînim bîra we û ser binivîsînîm. Vê rojê tînim bîra we gava stêrekî dîtir ji ezmanê wêjeya meyî sêwî , weke berhemdarên wê, berî çend rojan vemirî.

Roja pirtûkê a navnetewî , di 23 ê Nîsanê de tînim bîra we ku her sal tê lidarxisin . Û ez zanim ku di nav gelê me de, xwêner pir kêman û bi taybetî bi zimanê me û asta nexwendinê dighê hejmareke bilind ji civaka kurdî .Lê dîsa jî, xwe qayîl dikim bi baweriyekê ku pêdivî ye ez peyama xwe rabigihînim.

Di 23 ê Nîsanê sala 1666 de, du nivîskarên çîhanî ji ba me barkirin. Yê yekem Mîkaêl Dê Serfantîs e, ku rojekê biryar da li ser cotyarekî xeyalî binivîsîne û berhema „ Donkîşot „ anî vê rohnayê. Û yê duwem nivîskarê dramturg yê gewr e Şikspîr e, danerê „Romiyo û Jûlîyet „ .Ji bandora xemgînî û şîniya hevalên van her du nivîskaran, ser koçkirina wan, Yûnîsko biryara xwedî nimreya 3.18 da ku roja 23 ê yê Nîsanê bibe roja pirtûkê a navnetewî.

Ev biryar weke qîmetdaneke ji hêla mirovatîyê ye bo ked û xebata her berhemdarek , her wêjeyan e ku mijûlî şaristaniya civakan dibin. Mora ewan kes di mejiyê gelê wan de dimîne û dibe rêber weke heyvê bo nivşên duwa hatûyî re. Amûrên netewbûnê û jîndariya wê bi destên xwe avadikin. Ma kî kare peyvên A.Xanê ku beriya 400 sal ragihandiye „ Em kurd ger me heba îtîfaq „ , jîbîr bike?. Ev in kesê rêgeh ji êlan û komên ji hevcudayî ji mirovan bo yekîtiyê û netewbûnê rê vedikin beriya ku ramyarek hebe.

Lewra ew an kes hêjane di çavê civaka xwe de , û bi ber tiştên pîroz wan xelat dikin. Ji bilî me , em kurd ku her tiştên me ne weke yê gelê vê çîhanê ye. Doh Arjîn bû , îro Arşev e û sibe hinek din bin, di jiyana rojane de , ti guhdan bi wan ve nabe. Lê hema koç dibin ji nûve em li serê xwe dixin. Ev durûtiya me ye, bûye pesneke me ku ticarî rê bo netewbûnê venake. Ereke zûbizû li milên me dikeve ku em DAN (dî,ey,en) a xwe ji nûve analîze bikin bo em bi serbîkevin. Yana em ne hêjana bibin netew, ger welê li hêviya demê an hikan bibin, bo me bikin netew e, ev ji rastiye dîr e. Ger welê em perçekirî û ne jihev hezkirî bin di nav vê çîhana bê dilovanî de , lapên xwe di bin cengên xwe de bihêlin pepûkî bimînin. Hênga baye.. baye (bay...bay) kurd û kurdîstan, lê binêr in tenha wêje û çand bigelemperî kare netwan avabike ne remyarî û listikên wê, lewra gazî destgeh û rêxistinên dikim xwedî li wan derkevin, ger hûn nûnerên rastetqîne yê gelê xwe ne û armanca we avakirina netewa kurd e be, yana em ne hêjane bibin netew e.

Bêwar Barî Teyfûrî

be war@inbox.ru

GEL ZÎYARET E



Çi hat serê me ji kevneşopîyê hat. Kevneşopîyê em parçe parçeyî kirin û pêşeroja me xitimand, ji pêşketinan em dûr û mehrum man, pêşda neçûn. Kevneşopî fehm, cesaret û zehniyata mirov û gelan dukuje, ji demê a hemdemî qut dike, gelê kevneşop ji demê tê xewle kirin an jî demêda şikeste, dukule, bi kêmasîya u şaşîyanva nefesê distîne.

Kal bavê me (bapîre me) ka ji mera ci hîştine?

Ji kevneşopîyê: eşîretîye, tayfebazîyê, xelqperestîyê, cehaletîyê, olperestîyê, cudatîyê, ji îxanet û koçbertîyê, hevdu qebûl nekirinê pêştir tu tişt nehîştine.

Lewma jî jîne ji bo me dijwar û girane, me qebûl nakin. Em bi xwe jî hevdu napejrin. A ev jî bobelatara rê vedike. Em erzan, nezan û bêfehm tînen xuya kirinê, ji goveka mirovahîyê der me nîşan didin. Jîyana bêşerefra kurdên bi sîyanet tu west qaîl nebûne u nabin jî.

Dema hemdemîda berpirsîyarîke mezin dikeve li ser me kurdan. Ji bo ku em şaşîya bernedin, mînanî bapîrê xwe bi kêmasîyava nejn, dest bi jîyanek bi wate, hêja u layîq bikin pêwîste em bi hevra dijî kevneşopîyê bi taybet ji hemberî olperestîyê û tayfeperestîyê bi îsrar rawestin, vî karîda bi bîryarbin. Van helwestan bi sed salan jîyana me dane xitimandinê, em paşda hîştine. Hemû nîrxên ê pîroz u derfetên balkês em dûr mane: mînak - azadî, yekbûn, xwendin, pêşeroj, serkeftin, wekhevî, welat, jîna bi rûmet u rihet u y.d.

Welatê xweda xerîv bune. Ji bo ku em bibin xwedanê van pîvan û nîrxên mirovahîyê ên pîroz giranbuha lazime dijî cehaletê jî derên. Cehalet û kevneşopî kujerê pêşerojêye ji bo gel derbeke mezine, civakek bê menewîyat, bê heste netewî digihîne, civaka bê hestê neteweyî jî saxlemîya xwe a neteweyî wînda dike, nexaşê, ji bo qenc kirina wê perwerda netewî pêwîste. Perwerda netewî çîye?

Her gel nîrxên wî ên menewî gelêrî hene: wêje (edebîyat) - helbestvan, nivîskar, berhemên wan, zargotin, dîrok, huner, **çêografya** welat (erdnigarî). Hînbûn, tederîsa van zemîna, wesîla perwerda netewe, ji bo şîyarbun a hestên netewî bingehe û destpêke. Gel, civak ku ji van nîrxên menewî ên netewî dûr dimîne an ji wînda dike ji perwerda netewî merhume, bê rêk u pêke, bê toreya, xwe nasnake, nikare yekbûna xwe ava bike, pêşeroja wê tarîye, tu west jîyanêda ser nakeve, hertim rastî tehkîr, tinaz u înkare tê, zulm-zorêra rû bi rû dimîne, dibe dîlê dem u xelqê. Perwerda netewî ji dibistana netewî û ji çapemenîya netewî tê hezmandinê. Ev jî ji bo xwe naskirin û pêşketinan zerurete. Kevneşopî, cehalet hertim gelanra tehlûka pêşda tîne.

Gel zîyarete hêjayî secdêye, her mirovekî zane, têngêhîştî pêwîste jêra xizmetê û secdê bike. Gelê bê xayî parçebûyî û zeîfe, feqire.

Ewledên gel ên têngêhîştî, bi şeref gerek derfetê derfetê nedin ku ev gelê me yê dîrokî u kevnar nav sînorê cudatîyêda, parçebûyîna û li bin perda olî, oldarîyêda careke din neyê parçekirin û zeîf kirinêda.

Em ji zehniyata kevneşopîyê û sextekarîyê gel biparêzin, ji bo xatîrê azadî û pêşeroja nîfsên hatî. Bila ew jî ji mera lenetê neynîn ji bo şaşî û çewtan, îro heq û mafê tu kesi tune şaşîya berde. Şaşîyên kesan li ser netew gellekî buha rûdinê u zirarên mezin pêşda tîne.

Gel evraye, hêjayî secdê û rûmetêye. Hetanî em gelê xwera secdê nekin em nikarin azad bijîn. Jîyan meydana şeran, cengan, hewildanaye. Wekî hesdikî serbilind û azad bijî gerek cengvan û zanebî. Van meharetên jî ji bo civak û gel bona pêşketinan pêwîste bidî şuxulandinê.

Her mirovek, kesekî zane-întîlîgênt îfadekarê eş û kêmasîyên gel û civaka xweye.

Gelê întîlîgênt hertim pêşketîye.

Yekbûn azadîye, jîna bi wateye. Ji bo ku yekbûna xwe ava nekirîye gelê kurd hertim negêhîştîye armanc u daxwaza xwe pîroz û giranbuha.

Em rêya kal-bavê xweda nemeşin, ji kevneşopîyê, tayfebazîyê, tohildanê, olperest û nezaneîyê dest berdin. Ji dîrokê em îbretê, dersê hildin. Jîne jîrbûn û zanebûnê hesdike. Em jî jîr, zane u yekbin. Hevdu qebûl bikin, hevdu nasbikin. Ji bo pêşerojê ronî nîfsên hatî li ser nîrxên netewî tore û perwerde bikin. A eva peywîr û deynê hemûyane. Em bi xwera xwedî derkevin, demêra gave xwe bavejin, gavên pîroz. Hemû rê u derfet çebûne. Em serhildaneke giştî û bi rûmetda dijîn. Ji vê qadê ku dûr nekevin bê şik emê serkevin. Em ji hêjayî jîyanek paqij û azadin. Vê jîna evra, paqij gelê me bi xwîne qazanc dike a milyonanva...

Gelê ku bi yekbûn dimeşe tu dem tîk naçe. Ji bo ku yekbûn were parastinê jêra perwerda netewî û tore pêwîste. Dujmin hewl dide îrada me şikest bike. Lê em bi serhildanan bersîv didin. Me di nava sîstema koletîyêda hewl (cehd) didin bitewsînin. Lê heja me, dengê me, îrade û xastekên me meydan û qada koledara lerizand.

Ji bo kirin u şaşîyên kal-bavên xwe em nîfsên îro li ber tu kesî usa jî li ber dîrokê berpirsîyar nînin, ji bo ku bê destûr, bê îxtîyar bûne, xizmetkarê xelqê bûne. Bi tekîda desthilatdara bi dema dijî hevdu rawestîyane, bûne dujmin û kujerê hevdu, nava sînorê tayfetîyêda bê hêz û cûk mane, hertim hatine givişandinê, bûne aletê, hacetê destê neyarê xwe. Nava nezaneîyê û xizantîyêda hatibune xitimandinêda. Hemû derfet û şansên wan ên pêşketinan bi deman ji wan hatibû xewle kirinêda, nîrxên netewî, menewî ji wan dihat copandin, lê ew bêşik bê fehmbûn, bibune wek zarokên dilsax û dilsaf dihatin xapandinê, hevdu qebûl nedikirin, hevdu îxanet dikirin, derbê giran li hevdu dixistin, dujmintaya di navbera wanda bi dewrana dom dikir hevdu nedibaxşandin, lê di destê bîyanîyan û dagirkerada hacet bûne. Lema jî em ji bo kirin û şaşîyên bapîrê xwe berpirsîyar nînin...

Ewana hertim li bin bandor û nezerata dujminda bûne, serbest jî nebûne, hatine parçe-parçe kirinê, gellekî kevneşop bûne.....

Yek jî wan ka ji mera ci hîştine???

Li nav sînorê tayfebazîyêda bicûk, bêdestûr bûne. Hem jî li nav goveka olperestîya cuda-cudada bê hêz mane. Lê em dema hemdemîda çî rewşêda, çî hiş û ramanê dane?.

Gel zîyarete hêjayî secdêye. Em gelê xwera secdê bikin. Ola me bila bibe yekbûna me. Yekbûn ji bo jîyana bi şeref şans û derfete.

Yekbûn azadî û jîyana pîroze. Yekbûn ronahîya pêşeroja mirov û gelane. Yekbûn hêzeke evraye. Bi yekbûn em gelê xwera xizmetê bikin. Gel zîyarete.

Dr. Ehmed Xelîl

dralkhalil@hotmail.com

Deh tembî ji bo ramyarên kurd Tembiya (9) - (Beşê 1)**Rêbaza Serokatîyê Ya Arî Vejîn!**

Çawa ku gewde bê serî nabe, gel jî bê serok nabe, ew serokên ku guhartinên bingehî di dîroka gelan de peyda dikin mirovî jîrek û gewre ne, ewan pêşengên gelan e, xemxarê rewşa gelên xwe ne, nasname û nixxên neteweyên xwe di xwe de dicivînin, bi serde jî ew vîna pêşdabirina gelên xwe bi cih tînin, dikarin vînan, ramanan û pirojeyan bikin destkeftin, ewin ên ku dîroka bi rûmet ava dikin.

Bi rastî ez naxwazim berve biryarên tûnd û bêsinor bişimim, lê ez neçar dibim ku bibêjim: Pirsgirêka serokatîyê li kurdistanê pirsgirêka herî dijware, û di gelek qonaxên dîroka me de bûye astengeke xemgîn, gelek bêtar bi serê gelê me de rijand û hîn jî dirijîne, ez va baweriyê, ne di bin bandora rewşa me ya sûsret de pêşkêş dikim, na, ez va baweriyê li ser rasteqînên dîrokê ava dikim, û dibe jî ku ne fort û pêdaçûn be ku ez bibêjim: Netewa me- di gelek deman de- bûye goriya pirsgirêka (Serokatîyê).

Gelo, ma sedemên va pirsgirêkê çi ne?

Û çawa emê xwe jê rêzgar bikin?

Çawa Pirsgirêka (Serokatîyê) Peyda Bû?

Ji me ve tê xuyan, ku pirsgirêka (Serokatîyê), di civata kurdî de, ji sê hêmanan peyda bû ye:

Hêmana Yekemîn: Hizra Ramyariya

Arî: Gelê kurd ji hevyeqbûna pêşiyên me yê Zagrosî û Arî peyda bû, û tê zanîn ku pêşiyên Arî, ji dor sala (2000b.z)de, serokatî bi dest xwe de anîn, û bingehên ramyarî û kultûrî ji netewa kurd re danîn, gelê Med şaqê dawî bû ji beşê Arî, di navbera (650 – 550 b.z)de Medan kultûra Arî di nav pêşiyên kurda de belav kirin, û tiştê bêguman ewe, ku hizra Arî desthilata navend û diktator napejrîne, û berve hizra (demoqratiya pêşewan) dere, eva jî di warê ol û ramyarîyê de tê xuyan, çunkî ol û ramyarî ruyên desthilatdariyê ne.

Di warê olî de: Nêrînên Arî bawerî bi yek Xweda dikirin; lê ew Xweda ne bê hevpar e, di baweriyê Ariya de ewa Xwedayê tewri gewre û payebilind e, li rex wî hin Xweda yê din hene, tevli wî bi kar û barê rêveberiya gerdûnê radibin, û ew hêja yî naznavê (Xweda)ne.

Ev diyardeya di Zerdeştîyê de tê xuyakirin; **Ahûramezda** xwedayê mezine, û li rex wî hin xwedayên biçûk hene (Ferafaşî), wek (Raman hevastra) xwedayê aşîyê, (Serwaş) xwedayê guhdariyê (ita'etê طاعة), (Aşî) xwedayê narvîn (qederê) û bextewariyê, û (Raşno) xwedayê rêbazîyê û dadîtiyê (Evist, yasna, haytî 1, rû 4, 43, 44). Ev rûdawan di olên Girik de jî tînin xuyakirin, **Ziyos** xwedayê meze, li rex wî hin xwedayên din bi kar û barê rêveberina gerdûnê radibin, (Porîş) xwedayê ba ye, (Posîdun)

xwedayê derya ye, (Efrodêt) xwedayê evîn ye, (Etîna) xwedayê pendiyariyê ye (Will Diyorant: çîroka Şaristaniyê, beş 2, rû 322, 323. Cifî Barindir: Baweriyê Ên Olî ligel gelan, rû 66).

Di warê Ramyarî de: Ti desthilatdariyan navend a bêsinor, di nav gelên Arî de ava nebûn, bi piranî Yekgirtiya Êlan ava dibû, serokatîya eva Yekgirtina di destên serokên êlan de bû, ewan serokan yek ji nav xwe dipejirandin, da ko serokê mezin be, lê ne bi desthilatdariya bêsinor, da ku nebe serokê diktator, biryarên girîng di Komîteya Êlî ya Bilind de dihatin bidestxistin.

Tê xuyan ku bermaya Komîteya Êlî di peya (Kongirês)de maye, peyva yek ji awayên (Con Gir)ê, ya ku navê xwe bi kurdî jî (kon Gir)ê, û wate (Konê serokan= konê mezina= konê giran), û dibe jî ku navê (Komîteya Êlî) di peyva (Confediration) an (Konfedirasyon) de mabe.

Eva bû rêbaza ramyarî ya Arî ya resen di warê desthilatdariyê de, Girîkan û Romanan bi kar tanîn, û di serdemên nû de Ewropîyan û Emerikan rêbaza şahê firensîz Liuêsê 14mîn" **Ez Şahim. Ez Devletim**" rûxandin, û vegeyriyan rêbaza Arî ya kevin, bi tenê şahên farisan- ji gelên Arî- guh nedan va rêbazê, û desthilatdarî kirin diktatorî, çunkî ew ketin bin bandora hizra (Diktator), ya ku li Mezopotamya cihê xwe girtibû, diktator fermana desthilatdariyê ji Xwedayan digre, ne ji pêşengên gel, ev rêbaza faris ya diktator ta niha di payeva (Rehberê Komarê) di Irana îro de maye.

Di dîroka pêşiyên me de, gelek diyardeyên hizra ramyariya Arî hene, pêşiyên me yê Gotî (Çotî= Çodî) serokên xwe li gor mercên karî û jêhatîyê dipejirandin, û piştî ku destên xwe deynan ser Mezopotamya (erdnîgaiya desthilatdariya bêsinor), naznava (Şah) jê wergirtin, lê ne bi awayki bêsinor, aweya (Kon Gir) hat bikaranîn, Gotîyan şah li dor şeş salan dipejirandin, tenê şah Yarlagab (Parlagab) sê caran li pê hev ma serok, her carek pênc sal bûn (Diyakonof: îdya, rû 111 - 112), erê, pêşiyên me yê Gotî xwediyên rêcîma demokrat ya tewrî kevnin di dîroka Rojhilata Navîn de.

Ev awayê serdariyê li ba pêşiyên me yê Mîtanî û Med jî hebû, dîrokvanê girîng ê navdar **Hêrodot**, dide xuyan çawa Deyako (Dehyako) yê Medî ji pileya (serok êl) derbasî pileya (şahanî) yê bû, ewa serokê komîteyê şeş êl bû, di pê re serokên wan şeş êlan ew pejirandin ku bibe şah, lewre Deyako ne şahêki bêsinor bû, na, divya bû ku ew guh bide nêrînên Komîteya Êlî ya Bilind(Hêrodot: Dîroka Hêrodot, rû 77 - 80), kurê wî (Feraort) û nevî yê wî(Keyesro) jî ev rêbaza bi kar anî, û êlên Medan kirin yek, û Med ji Imperatoriya Aşuran rêzgar kir.

Hêmana Duwemîn: Seykolociya Kurdî:

Gelê kurd- ji hêla ikolocî de- kurên ciyê ne, ciya kilêta kesayetiya kurdî ye, lewre seykolociya ciya bi kûranî cihê xwe di kesayetiya kurdî de girtiye,

nêrîna teng, serhişkî, ezeztîya bêsinor, nepejirandina desthilatdariya kurdî, hin ji diyardeyên va seykolociyê ne, ta radeyekê ku mirovê kurd xwe dibîne ku ew dewleteka mezine.

Hêmana Sêwemîn: Dagîrkerina

Kurdistanê: Mayîna me, li dirêjahiya 25 sedsalan, di bin destên dagîrkeran de, kir ku hinek lawazî di kesayetiya û hizra me de cihê xwe bigre, û kultûra dûvelangiyê di me de çand, em ji hin sinciyên nixxîha rûciqandin, bîrewariya me ji kultûra neteweyî vala kir, ta radeya ku pîrê kurdên îro ti tiştî, li ser şahnişînên pêşiyên me û rêpaza wan ya ramyarî, nedizanin, kurdan çaxa ku çavên xwe li va cîhanê vedikirin, didît ku ew di bin desthilatdariya faris, an girîg, an roman, an rom, an ereb, an tirk de ne, ev rewşa dîr û dirêj, hêşt mirovê kurd bawer bike, ku ew qet ê nebe serdarê xwe, û tiştêkî sirûşte ku ew her dem dûvelang be.

Daxuyanî:

Ev gotara roja 1 – 8 – 2012 bi zimanê erebî hatibû weşandin.



WELATÊ ME

Ava Mezin(Dicle)

JI NÊZ VE NAS BIKE

Dicle yek ji herdu çemên mezin yê Kurdistanê ye. Çemê din Firat e. Dicle ji Bakurê Kurdistanê dest pê dika û li Kendavê digihe deryayê.

Nav û wateya Dicleyê

Di serdema kevn de ereban ji çemê Dicleyê re *Dijla*, faris û kurdan *Tîgra*, rûsan *Tîr* û yewnanîyan jî *Tîgrîs* gotine. Îro jî hemû ewropî ji çemê Dicleyê re, *Tigris* dibêjin. Koka gotinê yek e lêbelê her gelî li gor zimanê xwe bilêv kiriye. Gotina Dicleyê xerabkirina Tîgra ye. Lêvkirina Dicleya îroyîn nêzîkî bilêvkirina erebî ye. Wateya Tîgra "bi tîj û hêz diherike û mezin e". Ji xwe botî, cizîrî, mêrdînî û heta li hindek deverên Başûr hîn îro jî ji Dicleyê re dibêjin Ava Mezin an Çemê Mezin.

Şaxên çemê Dicleyê

Du milên Dicleyê hene. Serçaviya milek jê, çiyayên Master û Sarê ne ku nêzîkî gola Hezarê ne. Ev mil ber bi Madenê ve tê. Li wir navê wî êdî çemê Madenê ye. Ava Reş jî dibêjinê. Çemê Madenê ber bi Pîranê ve tê û di rojavayê Pîranê de ber bi başûr ve diherike.

Milê Dicleyê yê duyem jî, ji herêma Licê ji Bilqileynê derdikeve û ew jî ber bi rojavayê Hênê û rojhilatê Pîranê ve diherike. Herweha çemên Maden û Biriqleynê nêzîkî bajarê Eglê dibin yek. Pişt re ava Furkaşo (Devegeçidi) tê ser. Dicle îro di nav bajarê Amedê de, ber bi Bismilê ve çeng dide. Ava çemên Reş û Enbarê tîr ser. Pişt re ava çemên Batman, Xerzan û Botanê tîr ser û hîn xurtir û bi hêztir dibe. Di Heskîfê de, ber bi Cizîrê ve diçe û dadîkive başûrê Kurdistanê. Ji Mûsilê şûn ve ava Zêyê Mezin û Zêyê Biçûk tîr ser. Ji Zêyê Biçûk re Avaşîn jî dibêjin. Ji herêmen Lolan, Şemzînan û Geverê jî çemeke têrav tê ser Zêyê Biçûk ku jê re dibêjin Ava Heyatê. Ya herî dawî jî ji Zagros û herêma Îranê ava çeme Diyalê dikeve ser ava çemê Dicleyê. Dicle ji aliyê dirêjbûnê ve çemê Kurdistanê yê duyem e lê piştî ku derbasî Iraqê dibe ji aliyê debiya avê ve çemê Kurdistanê yê herî pirav û mezin e.

Dicle ji serî heta dawî 1900 km dirêj e. Di di nav tixûbên Tirkiya îroyîn de dirêjîya Dicleyê 523 km ye. Bi tevî, 600 km di nav axa Kurdistanê re derbas dibe. Li başûrê bajarê Bexdayê Dicle û Firat dibin yek û êdî jê re dibêjin Yekava Ereba (Şetelereb).

Tejaneya Dicleyê, 12% li nav tixûbên Tirkiyeyê (38.280 km²), 2% li Sûriyê (6.380 km²), 54% li Îraqê (172.260 km²) û 34% jî li Îran û welatên din e. Bi giştî qada avdaniya Dicleyê 319.000 km² ye.



Dicle di bajarê Mûsilê re diherike

Dicle di Tewratê de

Di çîroka Tewratê de behsa afirandina Adem û bihuştê tê kirin û navê çar çeman derbas dibin. Navê yê sêyem Dicle ye. Ka em li Tewratê binêrin:

"... Xwedê li rojhilat, li Êdenê bexçeyek çand û mirovê ku afirandibû li wir bi cih kir. Û Xudan Xwedê ji axê darên cûr bi cûr gihandin... Çemekî ku baxçe av dida ji Êdenê derdiket û li wir ji hev vediqetiya û dabeşî çar milan dibû. Navê pêşî Pîşon e; ew li nav hemû herêma Hewîla ku zêr lê heye, digere.



Zêrê vê herêmê baş e... Navê çemê duyem Gîhon e; ew li nav hemû herêma Kûşê digere. Û navê çemê sêyem Dicle ye; ew bi rojhilata Aşûrê ve diherike. Çemê çaran Firat e..." (Destpêkirin 2:8-14)^[çavkanî pêwîst e]

Dicle û mîtolojî

Di derbarê çemê Dicleyê de du mîtolojî hene.

Ya yekem: Tê gotin ku Xweda emir daye Pêxember Danyal û jê re gotiye ava ku ji şikefta Biriqleynê derdikeve, bi gopala xwe jê re xêzek bikşîne bila di wê xetê de biherike û here. Pêxember Danyal emir bi cih aniye û asaya xwe li serçaviya çemê ku ji şikefta Biriqleynê û heta Kendava Îranê diçe, dikşîne. Av di cûya gopale de dikerike û dibe çemê Dicleyê. Lêbelê ev xêz weha hatiye kişandin ku dema ava çem zêde û bilind bibe, ji bo ku zerarê nede xelkê xizan ên ku li der dora çem dijîn, av bikaribe ciyê xwe biguhêre. Loma çemê Dicle tim ciyê xwe diguhêre.

Ya duyem: Amedî bawer dikin ku ava Dicleyê raste rast diçe bihuştê. Xweda û firîştayên xwe li bihuştê ne. Li ser bingeha vê baweriyê jin û keçên amedî êvara cejna Qurbanê li ser kaxez daxwaz û gîlînameyên xwe dinivîsin û diçin ser pira Dehderî. Dest bi duayan dikin û nameyên xwe yê amadekirî di pirê re davêjin jêr. Name bi avê re diçin bihuştê. Nameyên ku bi avê re bi rê dikin, di demeke nêzîk de digihên destê Xweda û daxwaz û dueyên wan qebûl bibin.

Dicle û zebeş

Dibêjin ku li cîhanê zebeşên herî mezin û çêdar, li Amedê li ber çemê Dicleyê tîr çandin. Di meha nîsanê de ava Dicleyê hêdî hêdî diçike, kêmbibe. Li kenar û keviyên çem qûm û sîlik dimînin. Ev ax aluvyon e. Di navbera 15-30ê meha nîsanê de, êdî zebeşvanên amedî di nav wê aluvyona çem de dest bi kolana çalikên zebeşan dikin. Çalikên xwe 140-150 cm fireh û 40-60 cm jî kûr dikolin. Armanca kûrahiya çalikan a 40-60 cm ew e ku binê wê bigihe sewiya avê. Di navbera du çalikan de jî 50 cm mesafe dihêlin.

Borexane û qoxî

Li gundên derdora çem ji bo kevokan ji kerpîçan xaniyên taybetî çêdikin. Ji van xaniyan re *borexane* dibêjin. Ji ber ku bi kurdî ji kevokên mezin re *bore* dibêjin, loma ji xaniyên wan re jî *borexane* dibêjin. Borexaneyên gundên Tirelo û Şerabiyê bi nav û deng in. Di her aliyên borexaneyan de, bi dehan qulik hene ku bore di wan qulan de diçin hundir û derdikevin der. Di hundirê wan borexaneyan de jî lîsên ango ciyên ku bore vedinişin text danîne. Kevok di wan borexaneyan de zîrç dikin. Ji zîrçên kevokan re jî qoxî dibêjin. Ev kevok bi taybetî ji bo qoxî tîr xwedîkirin. Di her borexaneyek de salê di navbera 2-4 tonan de qoxî tê berhevkirin^[çavkanî pêwîst e]. Di zamanê berê de ev qoxî bi tenê ne ji bo zebeşên ber çem dihatin kom kirin; herweha difrotin herêmên Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn jî. Îro borexane hema hema nemane û qoxî jî weha kêmbûye ku êdî bi tenê tîra zebeşên ber çemê Amedê nake.

Çandin û qoxîdana zebeşan

Pêşî dendikên zebeşan li ciyekî din wek bexçe an li malê dikin nav axê û şîr dibin û dibin şitil. Şitlên zebeşan dibin di wan çalên (koncalên) amadekirî yê ber çem de, yek bi yek datînin. Roja diduyan qoxî dikin ber şitlan. Cara yekem ji bo her çalêkê bi qasî du kîloyan koxî û axa ku li nav hev xistine û kirine wek xerc dikin çalê.

Qoxî divê di bin çalê de bigihe avê. Qoxî di avê de zûtir dihele û şitlên zebeşan bi ava wê dimijin. Ji vê qoxiya cara pêşî re permist dibêjin. Ji bo qoxiyê bi permist davêjin nav koncalê.

Qoxiya cara duyem 10 roj piştî qoxiya cara yekem tê dayîn. Piştî 10 rojan ava ku gehîştibe koka şitilê divê çikiya be û dakeve jêr. Vê carê qûma der û dorê hêdî hêdî tê kolan, kok û rehên şitilê derdixin der. Qoxiya duyem carek din dikin ser reh û kokên şitilê. Armanç kok him av vexwin û him qoxi di nav avê de bikevin ser reh û kokan û carek din bi av û qoxî bimijin û adana xwe bigrin. Av çiqas biçûkê û berjêr dakeve kok û reh jî hewqas berjêr û kûr diçin.

Bi payîzê re êdî zebeş mezin dibin û digihên. Zebeşên Amedê yên ku li ber çemê Dîcleyê tîn çandin yeka wê 50-60 kîlo ye. Xwedî di nav zebeşan de kepir çêdikin û bi roj û şev dibin wan kepiran de li zebeşên xwe dinêrin.

Dîcle û hatinûçûyîn û bazirganî

Li ser çemê Dîcleyê dîroka komunikasyon û bazirganîyê gelek kevn e. Heta serdema sumeran diçe. Li gor arkeolog û lêkolînêran di dema sumeriyana de, li ser Dîcle û Firatê kelek û qeyîk çêkirine û bi riya avê di nav bajarên de kûtal (mal) û tiştînan birine û anîne. Di navbera bajarên Kîş, Lagaş, Nîpûr, Aşxur de riya avê bi kar anîne. Di serdema Asuriyan de jî, di navbera Amed, Nînova û bajarên din de li ser Dîclê hatinûçûyîn û bazirganî hebûye. Hîn îro jî li Başûrê Kurdistanê li qeraxê Dîcleyê xerabeyên bajarên qedîm Nînova û Nemrûdê hene. Di vê mijarê de di dîroka Heskîfê de nivîseke gelek balkêş heye û beşek ji nivîsê weha ye: "Ji dûr ve li ser avê qeretûnên reş xuya kirin. Dema nêzîk bûn ku qefleya kelekane e. Gelek kelek li pey hev dihatin. Ji Diyarbekir derketibûn ser avê, mirov nizanibû ka ev çend roj in ku li ser hatine û niha gehîştine Heskîfê. 52 ta (çewal) genim û ceh li kelekane bar kirine. Dê bibin Musilê û ji wir jî bibin Basrayê. Sal 1726 an jî 1727 e. Osmanî bi xanedayên Safavî yên Îranê re di şer de ye . Ji eskerên herêmê re, bi vê riya avê alîkariya zexîre dişênin. Wîlayeta Diyarbekirê ji bo wîlayeta Basrayê embara zexîre ye. Û pêdiviyên herêma Basrayê bi vê riya Dîcle re tîn temîn kirin. Haziriya rê gelek dem digire. Pêşî meşkên kelekane sîparîş dikin. Kelekvanî ji demeke zû ve li vê herêmê tê kirin. Ji bo ku rêwîti ber bi çuyîna avê ve ye, palkêş zêde zehmetî nabînin. Bi tenê dema herikîna îstîkameta çemê tî guhertin û dema di bin pîreyan de derbas dibin, palkêş divê hemû hêz û hunerên xwe bi kar bînin. Di Heskîfê re gelek kelekvan derbas dibin. Carnan ji Heskîfê jî kelekên zexîre beşdarî karwanê van kelekane dibin. Helbet ev tiştên ku bi kelekane dibin bi tenê ne zexîre ne. Carek ji bo ku li Bexdayê di îmaretxanên barûtê de bi kar bînin 200 kelek bi darên hevirsan bar kiribûn. Ji bo çêkirina qalibê topan ax, hesin, tîl û qele ji Diyarbekir bar dikirin û dibirin Basrayê. Herweha dîsa ji Heskîfê jî çend kelek beşdarî wan bûn..."

Niha jî li ser Dîcle ji Yekava Ereb heta nêzîkî Bexdayê keştiyên mezin û ji wir jî heta Musilê keştiyên biçûk li ser Dîcleyê diçin û tîn. Heta 30-40 berîha ji der dora Pîranê êzing û bar li kelekane dikirin û li ser siwar dibûn çend kesan bi daran kelekê birêve dibirin. Gelek meşk dinexandin, dar

li ser wan girê didan û piştê bi tonan êzing û daran li ser wan kelekane dikirin û ber dida ser avê û danîn Amedê. Piştê ku tekellên erebeyan derketin vê carê di şûna meşkan de tekerlek bi kar anîn. Gelek tekerlekan Traktor û kamyonan ên kevn bi hev ve girêdidan, bar li wan dikirin û berdida ser avê.

Dîcle û avedanî

Bi taybetî li Mezopotamya jêrîn avên Zêyê Mezin û Biçûk û Diyalê digre û sewiya debiya ava Dîclê zêde dibe. Yek jî Dîcle di herêmeke serberjêr de diherike; ava wê bi hêz e. Bi taybetî di mehên zivistan û biharan de Dîcle har dibe, ji ciyê xwe derdikeve û zerarê dide herêmên der dora xwe. Ango Guhdariya Danyal nake. Loma hîn ji serdema Sumeriyana ve jê re li çareseriyê geriya ne. Sumeriyana 3.000 sal berî Mîladê li pêş çemê Dîcleyê bend çêkirine. Li gor dîtin û agahdariyên arkeologan di wê serdemê de du wezîfeyê wan bendavan hebûne. Di demsalên zivistan, bihar û payîzan de ji bo ku pêş li rabûna avê û laserê (lehiyê) bigrin bend û dîwarên bilind û mezin çêkirine. Havînan jî zevî û bexçeyên xwe av dane.

Dîcle û bendav

Wek zemanê berê niha jî ji ber lehiya Dîcleyê, li Îraqê cara yekem di sala 1939an de bendava Kut, di sala 1958an de bendava Samarra û di sala 1961ê de jî bendava Dokanê Çêkirin. Bi van bendavan him pêş li Laser û zerarê girtin û him jî bi wan bendavan avadaniye kirin. Êdî kême be jî pêş li harbûn û dînîtiya Dîcleyê girtine.

Li Bakur jî di projeya GAPê de biryara şêş bendavan hatibû dayin ku li ser çemê Dîcleyê werin çêkirin. Him jê enerjî bi dest bixin û him jî avdaniyê bikin. Heta niha li herî jor Nêzîkî serçaviya Dîcleyê li rojava û rojhilatê bajarê Pîranê du bendav li ser Dîcleyê hatine çêkirin. Bendava ku li rojavayê Pîranê ye û li ser çemê ku ji herêma Madenê tê bi navê bendava Keça Qiral bi zazakî navê wê ye orjînal Keyneyî Qiralî ye. û ya li rojhilatê Pîranê ku li pêş ava çemê Biriqleyê tê çêkirine, navê wê jî bendava Royê Vêrdanî ye. Tirkan navê Dîcleyê li vê bendavê kirine û ji ya Keynê Qiralî re jî dibêjin Kral Kizi Baraji.

Bendava sêyemîn li nêzîkê şaroçka Egilê bi navê Furkaşo (Devegeçidi) hatiye çêkirin. Ya çaran li ser çemê Batmanê hatiye avakirin û navê wê jî Bendava Batmanê ye. Niha jî li Heskîfê nêzîkî Kerboranê dest bi çêkirina bendava Germav (İlsu) kirine. Bendava Germavê 1820 metre dirêj û 135 metre jî bilind e. Kapasîteya wê 1.200 megawat e û di saetek de 3,8 milyar kilowatt enerjî dê biafirîne. Bi temamkirina bendava Germavê re bajarê Heskîfê yê dîrokî, 52 gund û 15 nehye dê binav bibin. Çanda Kurdan û ya herêmê ya 10 hezar salan noqav dibe.

Piştî temamkirina Bendava Germavê vê carê dê dest bi çêkirina bendava Cizîrê bikin. Bendava Cizîrê di navbera sêgoşeyê Bakur, Başûrê Mezin û Başûrê Biçûk de ye. Dê bendava Cizîrê di salê de 1.208 milyar kwh enerjî bide û 66225 hektar arazî were avdan.



Dîcle û masî

Di demên berê de, di çemê Dîcleyê de gelek cureyên masiyan hebûn. Piştê her ku ava Dîcleyê hat qirêj kirin û bi dînamîtan masî hatin kuştin, gelek cureyên wan qediyên an jî kême bûn ku mirov îro nikare bibîne. Hezar mixabin ku heta niha kesî li ser cureyên masiyên ku di Dîcleyê de hebûn û hene lêkolîneke zanyarî nekiriye û encamê nenivîsiye. Min hewl da ku li ser cureyên masî yên ku di çemê Dîcleyê de hene lêkolînekê bikim, ez bi rojan lê gerîm, lê kolam bi daxewe min encameke baş bi dest nexist. Lê dîsa jî min çend cureyên masiyên Dîcleyê dîtin û tespît kirin. Yên ku min dîtin ev in: Masiya çemê Dîcleyê ya herî bi navûdeng şapûd (*Tor grypus*) e. Şapûd 25-50 cm dirêj e. Yeka din masiya zîvîn an masîzîv (*Chalcalburnus mosullensis*) e û bi tenê di çemên Dîcle û Feradê de hene. Lêkolînerêkî Ewropî di sala 1843an de masiya zîvîn tespît kiriye û yek bi yek hejmartine. Masiya Mezopotamya (*Silurus triostegus*) jî bi tenê di çemên Dîcle û Firadê de hene. Loma vî navî lêkirine. Masiya Mezopotamya li çenika wê jêrîn du û li ya jorîn jî du perên dirêj hene. Ji masiyên Dîcleyê yek jî masiya sabûr e. Masiyeke bi dasî ye. Kurd û îranî vê masiyê ji bo xwarina Newrozê çêdikin. Mirwarî (*Cyprinidae*) jî di çemê Dîcleyê de curek masî ye. Pûlen wê ji bo ku wek mirwarî (încî) diçirise jê re dibêjin mirwarî. Niha di van salên dawî de cureyên masiya mirwarî di gola Wanê de jî hatine dîtin. Lêkolîner dibêjin ciyên çem tîn ser ava golê li delava wan masiyên mirwarî hene. Mirwarî di navbera 15-24 cm de ye. Marmasî jî di çemê Dîcleyê de gelek in. Goştê marmasiyê him wek derman tê bi kar anîn û him jî tê xwarin. Goştê marmasiyan spî wek ê mirîşkê ye. Devmezî (*Aspius vorax*), ji bo ku çav biçûk û dev mezin e, jê re gotine masiya devmezî. Masiyeke çemên mezin e û ew bi xwe jî mezin e. Mezinên wan 12 kîlo ne û dikarin 20-25 sal bijîn.

Li Bakur piştî çêkirina bendavan, dewletê tov û çêlikên masî yên çêkirî (sûnî) avêtin nav ava bendavan. Niha ji 20 cureyî bêtir masî di nav ava bendavên ku li ser çemê Dîclê hatine çêkirin de hene. Di nav cureyên masî yên çêkirî de cureya ku hejmara masiyên wê herî zêdene masîpank (*Cyprinus carpio*) e. Bi îngilîzî *common carp*, bi tirkî jî navê *aynali sazan* lê kirine.

Jêder: Wîkîpediya kurdi

Celadet Alî Bedirxan

nas bikin

Celadet Alî Bedirxan (z. 1893, Stenbol - m. 15'ê tîrmehê 1951, Hêcanê/Şam) siyasetmedar, rojnamevan û zimanzanê kurd bû.

Jîyangerî

Celadet yek ji lawên malbata mezin a kurdan Malbata Bedirxaniyan bû. Ew wekî pêşengê nivîsîna kurdî bi tîpên latînî tê nasîn. Di warê lêkolînên li ser zimanê kurdî de gelek xebitiye û li surgûn û nefiyê kovarên Hawar û Ronahî weşandiye. Xebatên Celadet bûn bingeha edebiyata Kurmancî ya hemdem. Di jiyana xwe ya siyasî da, Celadet beşdarî gelek çalakîyên neteweperwerane bû, ew endamê Xoybûnê û yek ji damezrînerên wê bû. Piştî şerê Bedirxaniyan dijberî Sultan Ebdilhemîdî, tevî malbata xwe ber bi Yemenê ve hate surgûn kirin. Piştî ku tevgera rizgarîxwaza Tirk bi serokayetiya Mistefa Kemal Atatürk bi serkeft, mafên Kurdan hatin berbendkirin, di vê demê da fermana bidarvekirina Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî derket. Emîn û lawên xwe Sureya çûn Misrê, Kamûran û Celadet jî çûn Almanyayê. Wan li wir dest bi xwendina bilind kir. Celadetî xwendina bilind qedand û bawernameya doktoraya Hiqûqê wergirt. Li sala 1930ê, ew hat bajarê Şamê û dest bi xebata niştimanî kir. Di nav zebata Xoybûnê da endamê pêşeng bû, ew yek ji beşdar û alîkarên Serhildana Agirî bû.

Ji bilî zimanê kurdî Mîr Celadet bi van zimanan jî dizanibû: Ingilîzî, Fransî, Almanî, Tirkî, Farisî, Erebi, Yunanî. Kovarên Ronahî û Hawar bi sernivîskariya wî derdiketin.

Nifşa sêyem a Malbata Bedirxaniyan di serê sedsala 20ê da bi Celadet, Kamûran û Rewşen Bedirxan ve destpêdike û xelesa vê malbata serhildêr ya dawiyê ye. Bêguman di xelesa dawin a Bedirxaniyan da Celadet Bedirxan cîhê heri giring digre. Celadet Alî Bedirxan an jî bi navekê din Mîr Celadet li 26ê Nîsana sala 1893ê li Stenbolê hate dinyayê. Bavê wî siyasetmedar û rewşenbîrê navdar Emîn Alî Bedirxan e ku ew jî yek ji kurên Mîr Bedirxan e.

Dema Celadet ji dayik bû, malbata wî li Stenbolê li sirgûnê bû. Dayika wî Seniha Xanim Çerkez e. Bavê wî Emîn Elî Mufetişê Dadgeha Stenbolê bû. Her wiha, wî li wan salan da di nav tevgera Kurdan da jî cihê giring digirt.

Ji ber ku Osmaniyan qedexa kiribû malbata Bedirxanî biçin Kurdistanê, Emîn Elî ji bo gihandina zarokên xwe bi çand û zimanê kurdî ji Kurdistanê çirokbêj dengbêj û mamostayên ziman û qerwaşan dianîn. Yek ji wan nivîskaran jî Helbestvanê navdarê Kurd Hecî Qadirê Koyî bû ku ew mamosteyê serekiyê zarokên Emîn Elî Bedirxan bû.

Celadet tevî xuşk û birayên xwe yê din li ber destê wan mezin bû. Her wiha Bedirxanî ji Stenbolê bi malbatên li sirgûnê yê wekî Şemzînî, Babanî û Cemilpaşayan re jî hevalbendî dikir.


Osmaniyan li malbata Bedirxan gumanan dikirin. Lewma karê fermî didan ber wan û her tim cihê wan diguherandin. Celadet di zaroktiya xwe de tevî bavê xwe di van sirgûnan da derbas kir û li bajarên wekî Stenbol, Isparta, Edirne, Konya, Aqqa, Nahlûs û Selanikê geriya.

Di 18 saliya xwe da Celadet li Stenbolê dest bi dibistana Medresaya Harbiyê dike. Di salên Şerê cihanî yê yekê da ew wekî mamosteyê gihanidina zabitan xebitî û di ser da li eniya Qefqasê li dijî Rûsan şer kir.

Piştî ku di encama şer da Imparatoriya Osmanî têkçû, û di nav welatparêzên Kurd da pêvajoya rêxistinê destpêkir, Celadet li Stenbolê ket nav karên siyasî û bû yek ji hîmdarên Komela Vêkxistina Civaka Kurd. Ew li pey derfeta damezrandina dewleteka Kurdî bûn.

Piştî şer dewletên serkeftî yê wekî Brîtanîyayê li Kurdistanê ketin hin hewldanan. Celadet li sala 1919ê tevî birayê xwe Kamûran û Ekrem Cemîl Paşa û Faîq Tewfîq çû Kurdistanê. Li cem wan Zabîten Siyasî yê Brîtanî Major Noel jî hebû. Armanca wan amadekariyên Peymana Sewrê bû.

Kemalîstan ku ji gera Celadet û hevalên wî haydar bûn suwar şandin ser wan û ew mecbûr kirin bizivirin. Celadet di vê gera xwe da heta Meletiyê li Kurdistanê geriya û li ser rewşa welat serwest bû.



Di encamê da, li Sewrê, di bin çavdêriya berdevkê Kurdan Şerîf Paşa, hin mafên netewî hatin nişankirin. Celadet di vê gera xwe ya Kurdistanê da di nav eşîran da gelek metelok, peyv û çîrok jî kom kirin.

Li sala 1922ê, dema Kemalîst hatin ser hukmî û Stenbol bidestxist, ji bo serokên Kurdan ku di nav wan da Bedirxanî jî hebûn, fermana mirinê derçû. Li ser vê yekê, Celadet tevî birayên xwe Kamûran, Safter Tewfîq û

birazayê xwe Heqî ve li sala 1923ê berê xwe da Almanyayê û li wir dest bi xwendina li zanîngehê kir. Li sala 1925ê, dema li bakûrê Kurdistanê serhildana Şêx Seîdê Pîran destpêkir, Celadet ji bo tevlibûna serhildanê bi dizî hate Kurdistanê. Lê heta ku ew giha welat serhildan hatibû şikestin. Ew careka din bi alîkariya eşîrên koçer ji Kurdistanê derket û zivirî Almanyayê.

Di vê navberê da, birayê wî yê biçûk Safter li Almanyayê ji ber nexweşiyê mir. Birayê wî yê din Tewfîq jî zivirî Tirkîyê û li wir bi zora Kemalîstan paşnavê xwe kir Çinar û ket xizmeta Tirkan. Vasif Çinar birazayê Mîr Bedirxanî jî di vê demê da ji aliyê Mistefa Kemalî ve wekî wezîrê perwerdeyê hatibû wezîfedarkirin. Vasif Çinar ji malbata Bedirxanî hatiye derxistin.

Kamûran piştî hatina Celadetî li Almanyayê ma û doktoraya xwe ya hiqûqê dawî kir.

Mîr Celadet piştî dawîkirina zanîngeha hiqûqê bêyî ku doktoraya xwe tamam bike hate Qahîre ya Misrê. Bavê wî Emîn Elî li ser doşega mirinê bû. Piştî mirina bavê xwe çû Beyrûtê û li wir bicîh bû. Di van rojan da, li Sûriyê û Beyrûtê gelek rewşenbîrên Kurd civiyabûn. Kemalîstan piştî serhildana Şêx Seîdî careka din berê xwe dabû rewşenbîrên Kurdan. Yê ku ji ber kêra wan filitîbûn, berê xwe dabûn binxetê.

Celadet piştî ku hate Beyrûtê ket nava tevgera welatparêzên Kurd. Di vê navberê da, hewldanên damezrandina rêxistineka neteweyî jî destpêkiribû.

Piştî tevlibûna Celadet, li 5ê Îlona sala 1927ê li Lubnanê li bajarê Bêhemdûnê kongreya damezrandina Xoybûnê pêkanî. Di nav damezrînerên Xoybûnê da ji bilî Celadetî rewşenbîrên wekî Dr. Nurî Dêrsimî, Qedrî Can, Dr. Nuredîn Zaza, Memdûh Selîm Wanlî, Hemze Bêgê Muksî, Ekrem û Qedrî Cemîl Paşa û serekên herêmî yê wekî Haco Axa, Emînê Perîxanê, Mistefa Şahin Begê Berazî, Bedredînê Hebizbinî û gelekên din jî hebûn.

Yek ji biryarên Xoybûnê ew bû ku ew ji bo piştgiriya serhildana Araratê li herêma sinorê binxetê têkevin nav hewldanên leşkerî.

Bi vê armancê Celadet tevî Haco Axa û Resûl Axayê Miheme li herêma Torê tevî suwarên Kurd êriş birin ser qereqolên Tirkan.

Lê ji ber ku ew negihîştin armancên xwe, Celadet berê xwe da Çiyayê Araratê û tevî serhildêrên Serhedê bû. Li dûmahiyê, ev serhildan jî têkçû û wî tevî Ihsan Nûrî Paşayî xwe avêt Îranê.

Li Tehranê Şahê Îranê Mehmed Reza Pehlewî xwest wî bi hin bertîlan ji tevgera Kurdan dûr bike û li devereka cîhanê jê ra konsolosiya Îranê pêşniyaz kir. Ji ber ku Celadet ew daxwaza Şah qebûl nekir, ew her wê demê ji Îranê hate derxistin. Piştî Îranê, Celadet demekê li Başûrê Kurdistanê û li Bexdayê ma. Lê Ingilîzan nexwest ew li Îraqê bimîne û rê li wî tengkir. Ew careka din jî bi neçarî zivirî Sûriyê û li Kurdistanê rojava xebata xwe meşand.

Li wir tevî endamên malbata Cemil paşayan, Hemzeyê Muksî û Haco Axa bi navê Civata Alikariya Kurdên Belengaz komeleyek damezrand. Armanca wan ew bû alikariya Kurdên ku ji bakûr revîbûn bikin. Sûriyê wê demê di bin dagirkeriya Fransayê da bû û têkiliyên Fransî û Kemalîstan baş bûn. Ji ber zixtên Tirkan, Fransiyayê jî nedixwest ew li Kurdistanê bimîne. Li Tebaxa sala 1930ê tevî rewşenbîr û serhildêrên Kurd ên din bi zorê li Şamê hate bicîhkirin.

Xebatên siyasî ên bêncam û dorpêçana dewletên serdest berê Celadetî dabû rêyeka din. Rewşa herêmê jî êdî dest nedida ku Kurd ji bo hevkarîyê dewleteka alîgir bibînin an jî serhildaneka neteweyî birêbixin.

Hin sedemên din jî ku Celadet her bi rewşeka nû ve dehf dabûn, rewşa navxweyî ya Kurdan bû. Di nav Kurdan da xwendin û nivisandin û karê rewşenbîrî gelek kêr bû. Li dûmahiyê, ew gehîşt bû wê baweriyê ku ji bo şiyarkirina Kurdan divê karê rewşenbîrî bike û biryara xwe da.

Li rojên sirgûniya Şamê Celadet dest bi karê zimanzanî û afirandina elfûbêyeka Kurdî kir. Celadet ji bilî Kurdî bi zimanên Tirki, Erebi, Farsi, Frensi, Rûsi, Yûnanî, Almanî û Ingilîzî dizanibû. Li gor fikra Celadetî, ew li encama muqayeseya gelek ziman û elfûbêyan gihîşt hindê ku elfabeya Latînî dikaribû berî li nivîsîna Kurdî vebike. Ji xwe ew ji sala 1919ê ve xwedî vê baweriyê bû û li Almanyayê li ser etîmolojiyê jî xebitibû.

Helbet, ji bo pêkanîna raman û îdealên xwe kovarek ji wî ra lazim bû. Li sala 1931ê ji dewleta Fransî destûr girt ku li Sûriyê kovarekê derbixe.

Piştî amadekariyan, li 15ê Gulana 1932ê hejmara yekê ya Hawarê gihand xwendevanan. Armanca Mîr Celadet ewe bu ku alfabeya Kurdî latînî bi vê kovarê li seranserê Kurdistanê belav bike. Mîr Celadet li kovara Hawarê de jî diyar kiriye ku ji bo yekxistina alfabeya kurdî çendî name ji bo Tewfîq Wehbî nivîsandine, lê mixabin tu bersîv wernegirtiye. Ji ber wê yekê jî li kovara Hawarê de dest bi nivîsandina zaravayê Soranî (latînî) kiriye.

Her li wê salê kitêba xwe ya gramêrê a bi navê Rêzimana Elfabê ya Kurdî çap kir.

Celadet Bedirxan li Şamê di rewşeka nebaş da dijiya. Kemalîstan li Tirkîyê dest dabû ser hemî mal û mulkê malbata wan. Celadet ji ber sedemên aborî mecbûr ma ku mamostetîya zimanê Fransî û parêzeriyê bike.

Ew li kolana Salihîye di odeyekê da dima. Ev ode navenda Hawarê, mêvanxane û cihê razanê jî bû. Çavên wî li bendê bûn ku careka din derfetekê bibîne ku bikare biçe Kurdistanê. Lê piştî ku serhildana Malbata Eliyê Yûnis jî hate tefandin, wî fahmkir ku di paşeroja nêz da ew derfet çênabe.

Ji bo vê yekê wî biryara zewacê girt û li sala 1935ê li Şamê bi dotmama xwe Rewşen Xanimê ra zewicî. Rewşen xanimê wê demê mamosteyî dikir.

Di zewaca wan da bi navên Cemşîd û Sînemxan du zarokên wan çêbûn. Her wiha, kurekê wan bi navê Safter jî hîn di yeksaliya xwe da miribû. Keça Rewşenxanê ya ji şûyê (mêrê) wê yê yekê bi navê Useyma bû li ba wan dima. Ji zarokên Celadet, Cemşîd li Almanyayê doktorî xwend û li sala 1999ê çû ser dilovaniya xwe. Ji Cemşîd kurek û keçek bi navên Kurd û Evîn hene. Kurd li Almanyayê doktorî qedandiye û niha jî li wir karê xwe didomîne. Evîn jî çalakvaneka civakiye û ew jî niha li Almanyayê dijî.

Her wiha, keça wan Sînemxan niha tevî malbata xwe li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê dijî. Sînemxan li gel nivîskar û endezyarê neftê Salah Sadallah (Nivîskarekî Kurde û nêzikî 25 berhemên wî hene) jiyana hevîniyê pêkaniye û wê jî du zarokên bi Navê Dilnaz û Azad heye. Dilnaz li Zanîngeha Sorbuna Fransa beşa wergeriyê qedandiye û niha jî li gel zarokên xwe (Cîwan, Mîro, Alan) li Parîsê dijî. Azad Endezyarê Elektrikêye û wî jî kurek bi navê Alan heye. Ew jî niha li Qatarê dijî. Sînemxan Bedirxan hewl dide hemû berhemên Bedirxaniyan kom bike û ji nû ve çap bike. Heta niha nêzikî bîst û pênc berhemên Bedirxaniyan û berhemên hevîna xwe Salah Sadallah çap kiriye. Niha bernameya wê ya herî girîng amadekirina Ansiklopediya Bedirxan e ku îsal 15.05.2011 li roja derxistina kovara Hawarê amadekariyên Ansiklopediya Bedirxan hate ragihandin. Armanca vê Ansiklopediyayê ewe ku hemû berhemên Bedirxaniyan li nav vê ansiklopediyayê kom bike û pêşkêşî xwendevanên Kurdî bike. Useyma jî niha tevî malbata xwe (sê keç Şîrîn, Nesrîn, Ruşen) li Beyruta Lubnanê dijî. Bi destpêka Şerê Cîhanî zextên siyasîyên li ser rewşenbîrên Kurd li Sûriyê careka din destpêkir. Dewleta Fransî di nav salên 1943ê û 46ê da bi zorê rûniştina li Şamê li ser Celadet ferz kir. Qedexa bû ku ew ji Şamê derbike ve. Ev bi zorê rûniştina li Şamê ji aliyê rejîma Sûriyê ve jî heta 1948ê hate domandin. Piştî destpêka Şerê Cîhanî yê Duyê Celadet dest bi karên rojnamevaniyê kir û li sala 1942ê li Şamê Kovara Ronahî weşand.

Pênc hejmarên Ronahiyê yê pêşîn li ser nûçeyên Şerê cîhanî bûn. Di demên paşîn da jî êdî Ronahî kovareka xwerû Kurdî bû û bi nivîsên li ser ziman, wêje û çanda Kurd hatibû xemilandin. Piştî ku li sala 1943ê Hawar hate rawestandî jî, Mîr Celadet giranî da ser Ronahiyê.

Hingê birayê wî, Kamûran, jî li Lubnanê kovareka Kurdî-Fransî bi navê Roja Nû derdixist. Serpêhatiya kovara Ronahî jî heta sala 1945ê ajot.

Mîr Celadet di jiyana xwe ya rewşenbîrî da ji bilî xebatên kovar derxistinê gelek kitêb jî nivîsîn. Her wiha, ji bilî kovarên ku wî derdixistin, di gelek kovarên Kurdî û yê zimanên din da jî nivîsiye. Ji ber tengasiyên aborî, Mîr Celadet li sala 1950ê li gundê Hecanê, ku nêzikî Şamê bû, dest bi karê çandî kir. Ji bo debara malbata xwe, ew mecbûr mabû karekî wiha bike.

Her çende gelek hevalên wî yê dewlemend hebûn û wan dixwest alîkariya wî bikin jî, wî alîkarî qebûl nedikir. Li Gundê Hecanê ji bo avdana pembûyê zeviyên ku diajot bîreka mezin kola. Di nameyên ku ji malbata xwe ra dinivîsîne navê wê bîrê danîbû Bîra Qederê.

Mîr Celadet li 15ê Tîrmeha sala 1951ê li gundê Hecanê nêzikî Şamê çû ser dilovaniya Xwedê û termê wî li kêleka bapîrê wî, Mîr Bedirxanî, li Goristana Mewlana Xalidê Nexşebendî li taxa Kurdan li Şamê hate veşartin.


Li van salên dawî de hinek nûçe derdikevin ku qaşo Celadet Bedirxan ji aliyê dezgehê hewalgiriya (îstîxbarata) dewleta Suriye ve hatiye kuştin. Lê belê heta niha tu belgeyek di vî derbarî de tûneye û zarokên Mîr Celadet (Sînemxan û Useyma Bedirxan) jî di vî derbarî de didin zanîn ku ev nûçe bê bingeş û ji gote gotan pêkhatiye.

Têbînî: Ev jiyanname ji aliyê Sînemxan Celadet Bedirxan ve hatiye serrastkirin. (17.07.2011)

Berhem

Elifba Kurdî, Rêzimana Kurdî, Rûpelên Elfabê, Ferhenga Kurdî, Rêzimana Elifbaya kurdî, Dîbaca nimêjên îzêdiyan.

Jêder: wîkîpediya kurdî



KLASÎKÊN KURDÎ

Meqaleya "Klasîkên me – an şahir û edîbên me ên kevin" ya Celadet Alî Bedirxan di kovara "Hawar"ê de.



Em dikin qala klasîkên xwe bikin. Lê berî ewilî divêt em li bêjeya "klasîk"ê hûr bibin. Ji ber ko ev bêje bi me ne nas e. Di edebiyata miletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasîkan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahir û edîbên klasîk rabûne. Ji wan edîb û şahiran bi xwe re jî klasîk dibêjin. Ewan edîbên ha teqlîdî edîb û şahirên yewnan û latînî dikirin û li gora isûl û qeydeyên wan dinivîsandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yani gelek isûl û şikilperest bûn. Ji edebiyatê pê ve ji her tiştî re ko di wextê kevin de û bi islûleke bijarte hate çêkirin klasîk dibêjin. Di warê mûsîqiyê de jî klasîsm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasîk dibêjin. Mîmariya klasîk jî heye. Xulase herçî fên û sinhetên ko bi wê rêzikê ve çûne ji wan re klasîk dibêjin. Gelo di edebiyatê de klasîkên kurdmanan kî ne? Ew kengê rabûne û bi paş xwe ve çi eser hiştine ?

Bersiva vê pirsariyê ne hêsanî ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe ji eserên beriya islamiyê hesêb tiştek ne maye. Piştî islamiyê ji nav kurdan gelek şahir, edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivîsandine; û ji wan milet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahirên tirkan ên mezin yên ko serê tirkan bilind dikin Nabî, Nefhî û Fizûlî her sê jî kurdman in. Yên ko bi kurdmanî nivîsandine gelek hindik in û wan jî bala xwe ne daye zîmên û çêtir kêfa xwe ji pirsên erebî û farisî re anîne.

Digel vê hindê ev çend eserên ko pêşyan ji me re hiştine edebiyata me a klasîk ditînin pê û di nav wan de eserine kûr û hêja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nîzing de folklorê tu miletî ne gihastiye derca folklorê me.

Herçî klasîkên me, herwekî me got ev behseke dirêj û zehmet e, û jê re wextekî fireh divêt. Ev ne îşê bendekê an du bendan e. Heke îro em vê bendê dinivîsînin mexseda me ne ew e ko em li vê behsê hûr bibin û klasîkên xwe bisenifînin. Bi tenê em

dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ko hinên din pê mijûl bibin û tiştekî tekûz bi ser xin.

Di vê bendê de emê bê awerteyî qala hemî şahir û edîbên kurdmanan bikin yê ko bi kurdmanî nivîsandine. Heye ko, hinekê wan bi tenê şahirê dîwanê ne û ne klasîk in. Bila misenifê klasîkan bi wan mijûl bibe û klasîkan ji neklasîkan bibijêre; û heqê herkesî li gora hêjabûna wî bidiyê.

Di vê babetê de di destên me de tu wesîqe nînin. Tiştên ko ez pê dizanim, min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdîrehmanê Garisî bihîstine. Ji milê din di kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyata kurdî hin not hene. Jaba ji melakî kurdman re di heqê edebiyata me de bendek da bû nivîsandin. Melayê kurdman, ji xêra Xwedê re, benda xwe ne bi erebî, ne bi farisî û ne jî bi tirkî, lê bi kurdmanî nivîsandiye. [Mebest ji Melayê kurdman Mele Mehmûdê Bayezîdî ye û di wê demê de Celadet-Alî Bedir-Xanî nedizanî ka navê wî melayî çi bû. Mele Mehmûdê Bayezîdî gelek destnivîs û belgeyên dî jî dane Alexander Jabayî, ravekirina Arîf Zêrevanî.]

Ewî melayî di benda xwe de qala tarîxa bûn û wefata her şahirê jî kiriye. Lê wer dixuye ko mela di van tarîxan de şaş e. Melê ew bê ko bi rastiya wan bizane, ji ber xwe de û bi texmîn gotine, û li hev siwar kirine. Digel vê hindê em gotinên melayê Jaba weke xwe diguhêzînin stûnên xwe. Di benda melê de tiştine xelet hebin jî ew bend di celebê xwe de esereke yekta ye. Herweki Xanî gotiye: »Kurdmanî ye ew qeder li kar e« .

Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Melayê Bate, Axayê Bêdarî, Ehmedê Xanî, Exmedê Nalbend, Smaîlê Beyazîdî, Şerefxan, Miradxan, Siyehpûş, Axayok, Mewlana Xalid, Mela Yehayayê Mizûrî, Mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Hecî Fetahê Hezroyî, Şêx Mihemedê Hadî, Şêx Evdîrehmanê Taxê, Nalî, Şêx Riza, Hecî Qadirê Goyî, Şêx Nûredînê, Şêx Mihemed Can, Evdîrehmanê Axtepî, Şêx Eskerî, Şêx Hesênê Nûranî, Şêx Mihemed, Kerbela, Elî Teremaxî, Mela Ünîsê Erqetînî, Melayê Erwasê, Kitêbeke Hisabî.

Pênûsa Min îro

Serhan Isa

serhanisa@hotmail.com

Pêşgir heval, paşgir dost



Hebû tunebû min hebû Dostek ji Şilik
Hevalên berî Gir
heval ku xweştirîn û bijwêntirîn silava
di navbera du nêrzayan, an jî du mêrzayan
an jî mêza û nêrzayekî de ye,
îro ew silav,
ew silava berî Gir
ew silava bijwên
ew silava kesk
ew silava pir pêjin
ew silava ku,
ji kinarê Xwedê û Milyaketan dibarî
ew silava ku,
ji serê kaşê Alareşa heta bi Gir
silav dixindirî
îro ew silav jî, bû Girê Şilik,
û tu / hun mayî tenê Dost.
Dostên paşgir,
Ku hun îro ji Gir xindirî Dost
Erê Girdostno,
Erê dostgirno
Îro di bijwênîya vê wişeya yekwate de
Ez ê xwe te / we bêjim Şilik.
Dosto.. .
îro jî tu bê destûrname li Girên min dişolife
erê dostên Şilik
dostên Hişkeva dostên simbol
dostên efsane dostên poşman
dostên bahoz dostên baran
dostên pêjin dostên hejik
hun heyam û bedîlekê
di bîra zaroktiya me de Sêv bûn
di bîra gêncîtiya me de kesk û pir pêjin bûn
Îro jî û piştî ku hun di sipîbûna me de,
bûne dost, efsane , çîrok û çîvanok
êdî min jî, di devê peyvekê de
wisa nerm nerm digiriyam
û wisa dinehwirand
Ji gir xindirî min Sêv
Sêv xindirî min Sêv xwar
ew Dost xindirî min heval xwar
ew heval xindirî min heval xwar
ew poşman xindirî min Sêv xwar
dostekî poşman ji Gir xindirî Şilik xwar
Şilik xindirî hişkeva xwar
Ji gir xindirî min Sêv xwar
Hevalê min çû diyar e
Û dost çûne bazar e
Rehme li dê û bavê xwêner û guhdara.

Hoseng Broka

hoshengbroka@hotmail.com

Azadî ne dîn e!

KURT
û
KURMANCÎ

Di civakên dîndar de, ku Kurd jî berê heman dînê û heman nimêjê ne, „aqil dîn e“, û „dîn jî aqil e“. Li pey mantiqê dînerestan, dîn aqilê herî tekûz, bê kêmasî, herî pêşî û herî dawî ye. Ew aqilê çareser e (yan jî ew çareserî bixwe ye), ku rê ji wî diçe hemî aqil û hemî çareyan, çî li wê dinyayê û çî jî li wê dinyayê.

Dîn, bi qasî ku pirtûkên wî dibêjin, aqilê serasayî û sermirovane ye; aqilê reha, bê sînor, li derveyî ciyografî û dîrokê ye. Ew, aqilê hemî dîrokan, hemî deman û hemî cihan e. Dîn, li gorî aqilê dîndar, jî aqilê Xwedê bixwe ye: Wate Xwedê ne tenê aqil, belê berî aqil û piştî aqil e jî.

Xwedê, li pey vî aqilê dîndar, hemîşe aqil e: Ew aqilekî gurover e, ku ne destpêka wî, ne jî dawîya wî, heye. Ew aqilê „kamil, reha û mutleq“ yê guroverîya herûher û herûherîya gurover e.

Dîn bixwe, sînor in, lê sînorên aqilê jî dîn (bê guman li gorî mirîdên dîndar), tune ne. Dîn, bi mantiqê dîndaran, heta bi Xwedê ye, û jî Xwedê wêdetir û zêdetir jî, tiştê tune ye: Wate Dîn, Xwedê ye, Xwedê jî banê mirovan e, lê banê Xwedê asman, berî asman û piştî asman e.

Li gorî vî mantiqê „dîndar“, bê guman, dîn beza aqil a herî dawî ye:

Dîn „dawiya aqil“ e:

Dîn, alfabê e!

Dîn, ziman û rêziman e!

Dîn, nivîs û rastnivîs e!

Dîn, pirtûk û pêş-pirtûk û paş-pirtûk e!

Dîn, mefer e, û mefer dîn e!

Dîn, çare ye, û çare dîn e!

Dîn, rê ye, û rê jî dîn e!

Dîn, welat e, û welat dîn e!

Dîn dewlet e, û dewlet dîn e!

Dîn, xebat e, û xebat dîn e!

Dîn, felat e, û felat dîn e!

Dîn, destpêka e, û dawî dîn e!

Dîn, destpêka aqil e, û „dawiya aqil“ jî her dîn e!

Problem, bê guman li vir, ne hebûna dîn lê desthilatdariya dîn e; ne „azadiya“ dîn, lê zordariya dîn e; ne mîtolojiya dîn, lê îdeolojiya dîn e; ne baweriya bi dîn, lê siyaseta bi dîn e, ne destên dîn, belê lingên dîn e; ne çepikên dîn, belê pihînen dîn e; ne devê dîn, belê dinanên dîn e; ne defên dîn, belê gefên dîn e.

Pirs li vir, ne pirs „çima dîn hebû, heye, yan jî dibe“, belê pirs ev e:

Çima dîn hebûn e, û hebûn jî dîn e?

Çima dîn jiyan û paşjiyan e, û jiyan jî bi qasî paşjiyanê dîn e?

Çima dîn qanûn e, û qanûn jî dîn e?

Çima dîn ban e, û ban jî dîn e?

Çima dîn sînor e, û sînor jî dîn e?

Çima dîn aqil e, û aqil jî dîn e?

Çima dîn dil e, û dil jî dîn e?

Çima dîn gêwil e, û gêwil jî dîn e?

Nivîskarî jî, wek pencereyeke derbirîne, li „rojhilata dîndar“, bê guman, ne dîrî vî dîrokê û ciyografî, û herweha hebûn û qanûna dîn û dîn e.

Nivîskarî jî, li vî aliyê Xwedê (ku bi dîn re, radibe û rûdine, dixwe û vedixwe, basa xewnên ji sêvan, çemên ji mast û hinguv û refên ji horiyên buheştê û şevpeştên ji pêjna „Pira Siratê“, zebênî û tilîmisasên dojhê, dike), jî vî aqilê jî dîn, bi dîn, li ser dîn û di dîn de, helbet ne bîrî û ne bêpar e.

Nivîsandin jî, di vî ciyografiya dîndar de, wek alavekî ji alavên aqil, kem zêde, li bin banê haman hebûn û qanûna jî dîn, di çerxa heman aqilê jî dîn de, dizivire.

Mebest li vir, ne „kuştin“ yan jiholêrakirin û bidarvekirina dîn e, belê azadkirina hebûnê û bûneweran ji hukumanî û dîktatoriya aqilê dîn e.

Dîn, wek aqilekî bi darê zorê, bi ya min, ne mafek ji mafên mirovan e.

Wate, dîn dikare hindê erk û hindê maf ji hindê dinyayê be, lê teqez ew ne hemîşe erk û ne jî hemîşe maf e.

Belkû ya rasttir „azadî“ (ji azadiya giyan bigre heta bi azadiya aqil) mafekî rewa ji mafên herî sereke, yê mirovê vî serdemê ye.

Dîn, bi ya min, ne pîvana mirovan e.

Dîn, ne bawername û ne jî disiplinname ye:

Mirov, bi dîn, ne biçûk, ne jî mezin dibe; ne nizim, ne jî bilind dibe; ne kirêt, ne jî xweşik dibe; ne derwîn, ne jî rastgo dibe; ne reş, ne jî sipî dibe; ne xirab, ne jî çak dibe; ne iblîsane, ne jî pak dibe.

Dîn, ne hemî jiyan, belkû şeweyek ji şeweyên wê ye; ne hemî دنیا, belkû hindikek jê ye.

Dîn, hindê ji pirtûkê ye, lê ne hemî pirtûk e;

ew hindê ji nivîsandinê ye, lê ne hemî nivîsandin e;

ew hindê ji „loh û qelemê“ ye, lê ne hemî „loh û qelem“ e;

ew hindê ji dîrokê ye, lê ne hemî dîrok e;

ew hindê bersiv e, lê ne hemî bersiv e;

ew hindê moral û exlaq e, lê ne hemî moral û exlaq e;

ew hindê çare ye, lê ne hemî çare ye;

ew hindê Xwedê ye, lê ne hemî Xwedê ye.

Dîn, bi ya min, ne tenê hindê „yeqîn“, belê guman e jî;

ne tenê hindê bersiv, belê pirs e jî;

ne tenê hindê çare, belê problem e jî;

ne tenê hindê serkeftin, belê binkeftin e jî;

ne tenê hindê sipî, belê reş e jî;

ne tenê hindê buheşt, belê dojh e jî;

ne tenê hindê dest, belê ling e jî;

ne tenê hindê gav, belê pihîn e jî

ne tenê hindê Xwedê, belê Şeytan e jî.

Yên di dîn de, wisa bawer dikin, ku dîn bersiva herî hesan e, bo mirovan, çî li wê dinyaya îro sext, çiten û zehmet de, çî jî li wê dinyayê. Lê rastî (rastiya mirovan û dîrokê; rastiya mirovan li hundurê dîrokê, û herweha rastiya dîroka mirovan), bi qasî ez dizanim, ne wisa dibêje.

Ev rastiya ji dîrokê, wisa dibêje:

Dîn ji mirov e, lê mirov ne ji dîn e.

Dîn serencama mirov e, lê mirov ne serencama dîn e.

Dîn bi mirov e, lê mirov ne bi dîn e.

Dîn biçûk e, lê mirov mezintir e.

Dîn hindîk e, lê mirov pirtir e.

Dîn nizm e, lê mirov bilindtir e.

Dîn hişk e, lê mirov tertrir e.

Dîn hindê ji dîrokê ye, lê mirov hemî dîrok e.

Mirov, bê dîn, yan jî li derveyî dîn, dibe, lê dînek bê mirov û li derveyî mirovan, qet nabe.

Kurt û Kurmancî, mirov li derveyî „aqilê Xwedê“ dibe, lê Xwedê li derveyî „aqilê mirov“, nabe. Mirov, bê Xwedê dibe, lê Xwedê bê mirov nabe.

Herçiqasî Xwedê, li ser asta „aqilê dîndar“, bersiva ji aqil mezintir, a vî dinyayê û wê dinyayê be jî, lê ew wek „afrênerekî biaqil“, li ser asta „aqilê li derveyî dîn“, hîn ciyê gelek „pîrsên biaqil“ e.

Bê guman, pirs li vir, ne pirs baweriyê, belkû ya azadiyê ye.

Hindê ji dîn bixwe jî, dibêje: „Xwedê mirov azad daye“.

Wate, mirov û azadî, mîna cêwiyên hev, ji hev re, û bi hev re, tîndînyayê.

Mafê mirov li vir, wek bûnewerekî, ku dibe, berî her tiştî, azadî ye, lê ne dîn e; azadî ye, lê ne dîndarî û bawerî ye.

Azadî, ne dîn e, dîn ne azad e, û dînek azadiyê jî, jixwe nîne.

Azadî, ne li asmanan difire, belê li ser erdê dimeşe.

Berê azadiyê ne dîn, lê دنیا ye; ne li Xwedê, lê li mirov e.

Azadî, ne „ez“, ne „tu“, ne jî „ew“ e, lê „em“ in.

Azadî, ne yek e, lê pîr e!

Ne dîn e, lê dîtin e!

Ne bîr e, lê bîrkirin e!

Ne raman e, lê ramankirin e! Azadî, ne hov e, belê mirov e!



Lewend Dalînî

BRAYÊN BÊ NASNAME



Piştî çend rojan ji vegera herdû bira, Osman û Ferhan ji ser patozê, ku herdû her sal havînî diçûn çinîna genim û ceh; û karê wan jî drûtina devê çewalên genim bû.

Dema patozê diçûn, û hûr dikir, poş di paşiya xwe re diavêt û genim di gihîste jor û ê karker çewalên vala didan e ber boriya ku genim têre dihate xwar, û piştî dihate dagirtin; wan ew çewal didan ber kêl û zemên şûjin ê di dirûtin û berdidan xwar ê.

Osman brayê Ferhan ê mezin bû, û bi salek ê tenê jê mestir bû, ew weke du hevala bûn! Jinên wan jî xuhê hev bûn, tevî ku jê zanetirbû jî, lê Ferhan gotina wî li erdê nedixistin, û ew qebûl kiribû weke rêzan û şewirdar ê xwe!?!...Car carna ew li teşqela jî di qelibandin!? Lê dîsa jî lê dibûrand.

Ferhan axa: Ma tu hîn di xew de ye? Ma ne îro civan ê me û xwedî yê patozê ye? Ew perê mey mayî li cem; gereke bidê me, bi talaq eger salekî dijî em rîya xwe pênexin, ewî qurûşê Sûrî, ji mere neşand malê? Qey nayê bîra te bê parseko zêdey helaw û dolmikê qelandî, di nîvê havînî de nedida me? Mirîkî mezela ye!? Min di heyata xwe de zilam jê xesîstir û çiroktir, min nedîtin?. Osman ji devê derî derbas bû hewşê û bakirîyê?. Na na min ji bîr nekirîye? Va ez cilê xwe li xwe dikim, hebekî ji xwe re bi meş e, ezê bighime te?.

Li rîya vegeerê ku bêrikên herdiwan germ bûn, her yekî ji wan, ji xwe re mirîşkek qelew kirî, ji wan re gurandin, pirtikadin û dan e wan û ji wan re got: Bera kebanîyên we di beroşa pirîsto de bi kelînin, ji be ku mirîşkên me hebekî pîrin?. Û di rîya xew de jî çend kilo sêv û porteçal jî kirîn û çûne mal, lê Osman ji Ferhan re got: piştî şîvê were cem min îşekî min bi te re heye?.

Meyzêne Ferhan, va em ji ser patozê vegeerîyan, û va wext ber bi payîzî ve di çê û tu kar li vandra edî nîne ji min û tere!? Çend rojin emê van perê ku me ji ser mûsim ê anî ne, emê li ser rûnên û bixun!? Û peyre emê dest bi deyna bikin tanî sala bê!..Ev ne tu hale? Di vê em ji xwe re çarakê bikin?. Ferhan bêdengî lê guhdar dike û got: hema tu zanê? Tu çilo di bîne, hema weke te?. Başe, emê herin Beyrûdê?..Te go çawa? Erê erê Beyrûdê? Di bêjin ku li wir gelek kar heye, û roja tu bighê wir, roja dîtir tu di kar de ye? Û bi perê gelek jî!?. Xwedê ji te razî qey tu tinazê xwe dikî, ma tu nizanê ku çûna wir nasname jê re divê? Û tu dibîne ku em nikarin herin devereke û em weke hepişçiya ne wey? Niha ku devereke nasname jêre

neva jî, xem nedikir; Ferhan li Osman vagerand?. Yaho fêm bik bê ez çi ji te re di bêjim? Min zlamêk dîtiye û ew xwedîyê wê Otobîsa kû ji vir diçê Beyrûdê, gotiye perena bidin min û ezê we bi qaçaxî derbas bikim û we bighînim wir? Ma tu çîdî dixwazê!?.

Bi dilekî bi tirs û bi belengazî, di kursîkî ji ên wê Otobîsa kevnar, ku di bajarên Sûrî yê tevan re derbas dibû tanî ku digihîste sînore Lubnanê, û çî rêwingî yê ku di rê de destê xwe jê re hildida, lê disekinî û ew swar dikir, û eger cihê rûniştin û şipyabûnê di hundirê wê de jî nediman, ew

hildidan ser piştê wê!?. Di wan salên heftê yî û ji ber astengiyên abûrî, bi hezaran, karker di çûne Beyrûdê, ji bo kar!? û ew Otobîsa kevin û meş giran! Carna du roj û du şevan, hetanî ku wê rêwingî ji Cizîrê bi gihandina Beyrûdê!?.

Bi zeraqa rojê re gihîştin sînore! Ê Otobîsê çî berî derbasbûna degehê sînore bi pêncsed mitrî, ew peyakirin û şîret li wan kir û got: Çiya û çiya sînore qut bikin û dîsa werin se rê û bimînin li benda me!?.

Geh meşîn û geh revîn di wan çiyên de; û bi halekî kotekî, û piştî se'etekê, gihîştin ser rîyekê, û di dil xwe de ku li ser rîya ku wê Otobîsê çî wê bê û wê wan rakê bi xew re!?. Qederekî baş man lê tu pêjin jê nehat? Çend terembêl derbasbûn, lê tu kes li wan nesekinî!?. Hîn wilo ku li bendî Otobîsê ne, dîtî ku cêbek bi lez bi ser wan de hat û di cîh de li ber wan sekinî, çend Polis jê daketin, bi wan ve qedimîn û nasname ji wan xwestin?. Herdû jî gelekî bi zimanê Erebî nizanîbûn! Lê mesele fêm kirin!?. Bi milê herduwan girtin û ew xistin hundirê cêbê, û swarbûn û çûn!?. Piştî rojê û şevêkê, di girtîgihê de, roja dî sibehê, ew birin dadegihê û her yek ji wan du heftî hebs û pêncî wereqê Sûrî jî, cize dan wan!?.

Ji wî dused wereqê kû bi wan re mayî, sed jê dabûn dadegihê û sedê mayî jî dane bi çixarê û qet jî hesabê perê ê kû wê bi din kirya vegeerê nekirin!?. Piştî ku ewan panzdeh roj di zindanê de bûrandin, bi belengazî ew avêtin pişt sînore û berên wan dan ber bi sînore wê ve!?.

Min ji tere got ku çûna Beyrûdê ji mere nelazim e? Te biya xwe kir û wilo te em xistin vê tomikê de! De ka me xelaske ica? Ferhan di wê rîya ku dane ser û nizanin wê wan bighîne kû; ji Osman pirsî? Bê ku bersiva wî bide û ra û tevdîrekê ji

xwe re bidin darî çav? Got: gelekî serê min ne êşîne bide pey min û hew!?.

Xwe ji Qereqolên sînore parastin û ber bi çiyê ve bi lez herduan da ser xaçû rêkê û meşa xwe berdeyam kirin. Ji dûr ve pez û şivanek dîtî û bi rexê wî ve çûn! Û ji dûr ve silavek lê kirin û pirsî? rîya ku wê wan bighîne bajarekî yan jî rîya Terembêlan kirin?. Şivan gelek alîkarî bi wan re kir û rîya ku diçê Şamê saloxî wan kir.

Li ser rê, kî derbas dibû, destên xwe jê re hildidan? Lê mixabin tu kes li wan nedisekinî, û ew bi xwe re ranekirin! Û bi wî halê tî, birçî û westiya yî, meşa xwe berdeyam kirin û bêhêvîyên wan zêdetir bûn, û ji neçarî ji xwe re li bin siha darekê li ser rê, rûniştin, yekî piştê xwe da vî milê darê, û yekî da milê dî!?

Dema Şifêrê Kemyonê ê ku li nêzikî wan tekelê wê, ê paşî teqî bû û bi mebesta ku alîkariyê pêre bikin ew ji xeweke şêrîn şiyarkirin, ji xew bi lez rabûn û herdiwan jî ji xwere gotin ku va dîsa em hatin girtin!? û ji tîrsa re di cî de şipya sekinîn û bê deng man!?.

Ji kerema were hûn Karin bîne hinekî alîkarî yê bi min re bikin, da ez tekelê Kemyona xwe bi guherim, barê wê giran bû vê carê û dinya jî germe? Loma dibin bar de teqîya!?. Wexta wilo ji wan re got ji nûve xwîn di damarên laşê wan de gerî, û bêhn hate ber wan û bi hev re gotin: Wey li ser sera û li ser çava? Ew li ezmana li yekî wilo digerîyan xwedê li xakê ew ji wan re sand, û bi kêf û şahî dane pey wî.

Birçîbûn û wetîya bûn ji bîr kirin û weke du pilingan tekelê kevin vekirin û ê nû jê re swarkirin beyî ku bihêlin ku xwedî yê Kemyonê dest bidîyê? Ew bi wê yekê gelekî şa bû û di ber qedeha çayê û hinek taşte re ku bi hev re xwarin û di ber re jî çîroka belengazîya wan bihîst, gelekî dilê wî bi wan şewitî!.

Herdû ji xwe re kirin şagirtî û rîya ku wan bighîne Helebê, Ku xwedî yê kemyonê ku tê ji Beyrûdê û wê barê wê li wir deynê; soz da wan ku wê bar bi wan deynê bi kirê û li gor texmîna wî, gereke perekî baş be, loma ji eşqa car carna Ferhan qîr dikir strana, û tevî ku xwedî yê Kemyonê fêm nedikir jî, lê li pişt derkisyon, xwe di hejand.

Piştî ku bi germî xatir ji xwedî yê Kemyonê xwestin û gelekî spasîya wî jî kirin; dîsa li cem hev di kursîkî ji ên wê Otobîsa ku wê wana bighîne nav zarokên wan û piştî, ku her yekî ji wan dîsa ji zarokan re çend kilo fêkî û hinek şîranî kirîn û bi bêrik germî destên xwe ji hevalê xwe ê hêja re hildan û ji keyfa re; şûr simbêlê wan ne dibirî!?.

Di rê de dest bi henek û qerfan, li hev kirin tanî gihîştin malê.

Ehmed Mistefa



roj.ava2011@gmail.com

Alaya Rengîn

Ala me bedew û şêrîn e
Şêrîn e û xweş rengîn e
Rengîn e ji rengê buhare
Buhar xemila adare
Adar meha gulana
Gulên sor û sipî ne

Rengê gulana pir şêrîn e
Buhar bo kurdan mizgîn e
Ala rengîn buhar e şêrîn
Tuyî evîna xemilandî jîn
Kurdistan buhişt û evîn e
Ew keskesor e ew jîn e

Çîroka Kêza Terecan

Cewahirên Kurdî yên ku hîna ji nav zargotina Ezdahiyên ne hatine tomarkirin-2
Çîrokên me şahdetiya kevnariya mîtolojiya Ezdahîtiya me dikin

Danhev û amadekirin: **Kemal Tolan**



Pêşgotin

Bi dîtina min, şahde dîroka kevn ne tenê di şer, ceng, peyman, hevdîtin, desthilatdariya qîral, mîr, padîşah, siltan, egît, fêriz, beg û serok eşîran de anjî di wan delîl û dokumentên ji ber dîtina piraniya zane, lêkolînan, nivîskar û geryokên ku li goriya daxwaz û berjiwendiyên desthilatdaran hatine nivîsandin de tê xwanê kirin.

Gava meriv bikeve nava wêjeya zargotina civakê û li ser gelek efsane, mesele, çîrok, destan, peyvan, hêvî, urf, adet, libas, sema, xwarin, vexwarin, wêne, dîtin, perwerde, berhem, şop, şûnên li ser/bin axê, hemû kevnepêş, kiryar û pêwendiyên endamên civakê lêkolîn bike, hingê meriv dikare rastiya dîroka civakê a derbasbuyî bîvîne.

Vêca ez di roja 06.04.2012 de ji bo berhevkirina zargotina me çûme bajarê Hannoverê û li mala keçxala xwe Xatûn Tuko bûme mîvan. Jixwe ew çend salbûn ku em bi aremî li cem hevûdinê rûneştibûn û me li ser wextê derbasbuyî sohbet ne kiribû. Evarê wexta em bi malbetî û tevî zaroken xwe re rûniştin, me qala şevbêrk û çîrokên dema zarokatiya xwe kir. Dûre Xatûnê ji min pirsî, gelo ew çîroka kêza terecan, ya ku rahmetiya pîrika me Rindê harcar ji mere digot û em pê radizandin, têye bîra te? Min gote Xatûn û zîlamê wê Rauf, na mixabin, ez nikarim tevaya vê çîroka kêza terecan bibêjim. Lê, ezê sibê herime mala xwa xwe Sosê û ez bawerim ku zavê me Ahmet Yasit `e karibe vê çîrokê ji me ra bêje.

Gava ez û Xatûn di roja 07.04.12 çûne mala xwa min Sosê, Xatûn ji Sosê ra got; kêfa min gelekî tê ku zavê me Ahmet jî mîna ku di çîroka kêza terecan de hatiye gotin, wisa baş hurmetê dide keçmetika min. Dûre me ji Ahmetê zave daxwazkir, ka ew dikare vê çîroka kêza terecanê ji me ra bêje. Ahmet got, ez jî bi tevaya vê çîrokê nizanim, lê ez baş dizanim ku bavê Menal, kekê min Aydîn Ronak, dikare vê çîrokê gelekî xweş bibêje. Me rabû telefonî camêr kekê Aydîn Ronak kir û ew jî hat bi kêfxweşî tevî civata me. Dûre kekê Aydın Ronak ji me ra dest bi gotina çîroka kêza terecanê kir û weha got:

Pîrika min carê ev **çîroka Kêza Terecan** ji min ra digot:

Hebû tûne bû, kêzikek hebû. Kêza terecan rojekê biryara zewaca xwe da û got :

- Ezê derkevim ji xwe re mêrekî bi dilê xwe bigerim. Kêzê firiya çû çû heta li ba cotarekî dahnî.

Cotkar jê re got:

- Kêzê tû ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:

- Quzilqurta bavê kêzê, ji min ra...

Cotkar got:

- Pa, ez çî bêjim ?

Kêzê got:

- Ji min re bêje,

kêzê kêzê, kêzaxatûn ê,

xweya şimika reqreqûn ê,

xweya çavên kildayî,

xweya biskên berdayî,



ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Cotkar gotina wê dúbare dike û dibêje:

kêzê kêzê, kêzaxatûn ê ,

xweya şimika reqreqûn ê,

xweya çavên kildayî,

xweya şimika reqreqûn ê,

xweya çavên kildayî,

xweya biskên berdayî,

ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:

- Wele ez ji xwe ra li mêrekî digerim.

Cotkar got:

- Wekî tû li mêra digerî, ne ji min çêtir!

Kêzê fikirî û got:

- Ê başe, ku ez bi te ra bizewicim û rojekê niqaşek têkeve nava min û te. Em bihevve şerbikin, tû yê bi çî li min bixî?

Cotkar got:

- Ezê wî çaxî bi vê misasa xwe ya cotkariyê li te bixim.

Kêzê got:

- Na, ez te nakim.

Kêzê careke dinê rabû ber bi ezmanan dahnî.

Şivan jê re got:

- Kêzê tû ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:

- Quzilqurta bavê kêzê û ji min ra...

Şivan got:

- Pa, ez çî bêjim ?

Kêzê got:

- Ji min re bêje,

kêzê kêzê, kêzaxatûn ê ,

xweya şimika reqreqûn ê,

xweya çavên kildayî,

xweya biskên berdayî,

ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Şivan gotina wê dúbare kir û got:

- Kêzê kêzê, kêzaxatûn ê ,

xweya şimika reqreqûn ê,

xweya çavên kildayî,

xweya biskên berdayî,

ji kurve têtî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:

- Wele ez ji xwe ra li mêrekî digerim.

Şivan got:

- Wekî ku tû li mêra digerî, ne ji min çêtir!

Kêzê fikirî û got:



- Ê başe, ku ez bi te ra bizewicim û rojekê niqaşek têkeve nava min û te. Em bihevre şerbikin, tû yê bi çi li min bixî?

Şivan got:

- Ezê wî çaxî bi vî darê xwe yê şivaniyê li te bixim.

Kêzê got:

- Na, ez te nakim.

Kêzê careke dinê rabû ber bi ezmanan ve firiya çû çû heta li ba mişkekî dahnî.

Mişk jê re got:

- Kêzê tû ji kurve têyî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:


- Quzilqurta bavê kêzê, ji min ra nebêje kêzê !

Mişk got:

- Pa, ez çi bêjim ?

Kêzê got:

- Ji min re bêje, kêzê kêzê, kêzaxatûn ê , xweya şimika reqreqûn ê, xweya çavên kildayî, xweya biskên berdayî, ji kurve têyî û tû yê bi kurve herî?



Mişk gotina wê dúbare kir û got:

- Kêzê kêzê, kêzaxatûn ê , xweya şimika reqreqûn ê, xweya çavên kildayî, xweya biskên berdayî, ji kurve têyî û tû yê bi kurve herî?

Kêzê got:

- Wele ez ji xwe ra li mêrekî digirim.

Mişk got:

- Wekî ku tû li mêra digerî, ne ji min çêtir!

Kêzê fikirî û got:

- Ê başe, ku ez bi te ra bizewicim û rojekê niqaşek têkeve nava min û te. Em bihevre şerbikin, tû yê bi çi li min bixî?

Mişk got:

- Ezê wî çaxî tenê bi vî dîvê xwe yê nermik di ser piştê te ra bivim.

Kêzê got:

- Ev başe!

Kêzê û mişk bi hevûdinê razî bûn. Dûre heft roj û heft şevan, bi heft dahol û heft zirnan govenda xwe kirin. Dipey ra ketine xaniyekî. Rabû mişk gote Kêzê, ji bo ku em debara xwe bikin, tû kar û barên di nav malê de bike. Ezê jî kar û barên li derve bikim.

Kêzê jî got:

- Bila be!

Mişk gote kêzê:

- Ji kerema xwe ra, tû haj ji vê şîreta ku ez vêga li te bikim, hebe. Tû dizanî ku ez çiqasî hez ji te dikim û hezkirina me gelekî mezine. Eger Xwedê nekî, rojekê tiştek bêye serê te, debar, jiyana min na mîne û ezê bimirim.

Kêzê gote Mişk :

- De ka şîreta xwe bibêje.

Mişk got kêzê:

- Ez naxwazim tiştek bêye serê te. Ji kerema xwe ra gava carekê mêvanê me hatin, tû bixwazî xwarinekê ji wan ra çêkî, divê tû bi wê heska me ya destiyê wê kin kela xwarina xwe li hevûdinê ne xînî. Kela xwarina

ku tû amade bikî, timî bi vê heska me ya destiyê wê dirêje li hevûdinê bixîne.

Kêzê gote Mişk:

- Ser seran û çavan, ez ad didim te, ezê timî haj ji vê şîreta te hebim û ezê wê ji bîra nekim.

Rojekê gava mişk çuye cot, kêzê dît ku va hinek mêvanên wan hatin. Kêzê çuye pêşiya mêvanan û got:

- Hûn gelekî bixêr û ser çavn ra hatine. De keremkin, werin derbasî nav malê bivin.

Mêvanan li ber derî gotine kêzê:

- Xuşka dela, ka birayê me mişk ne li male?

Kêzê got:

- Na, birayê we mişk çuye cot, lê ewê niha were.

Mêvanan got:

- Na, nexwe pêwîst nake ku em rûnên!

Kêzê gote mêvanan:

- Çênabe, wele gava mişk were malê û bibihîze ku hûn li mala wî rûnenîştine û hûn bê xwarin ji mala me çûne, ewê hingê min kur bike.

Mêvanan hew karîbûn êdî xatirê kêzê bişkênin û ew derbasî nav malê bûn.

Kêzê bilez dest bi çêkirina xwarina dîzê (dan û goşt di navhev de, dixine nava beroşkekê û datînine ser agir) kir. Li aliyekî jî çay û qahwe bire ber mêhvanan. Hinga kêzê dît ku kela dîzê radibe, bi xwe jî kelecânî bû, ji leza şîreta mişk ji bîra wê diçe û hima zû raydêje heska destiyê wê kin e.

Gava kêzê kela dîz bi heska destiyê wê kin li hvûdin xist, ew ji bê taqetî kete nava beroşka dîza dan.

Hinga mêvan man, man û dîtin ku tu his hew ji kêzê tê.

Yek ji mêvanên ku gelekî birçîbû bû gote hevalê xwe:

- Ka ez biçim li kêzê binêrim. Bê ew çima evqas derengî bû.

Çaxê mêvanê birçî dîza kelandî dît, ewî ji birçîna ra hew xwe girt, destê xwe avête heska ku di nava dîz de çikandiyê û heskek berda nav tasa li ber xwe. Ewî dît ku va şeqekî kêzê jî di nav dîz de hatiye berê û kêz şewitî ye.

Dûre mêvan bi hevûdinê ketin û dest bi girî kirin. Porê xwe kişandin û şîneke mezin li darxistin.

Bi vê şîna wan ra mişk jî hate nav xanî.

Mişk pirsî:

- Go kuro çibuye ji we?

Mêvanan gotin:

- Bira bi Xwedê, gava em hatine mala te û tû ne li mal buyî, kêzê ne hişt em bêyî dîtina te vegerine malê. Kêzê xwast ji me ra dîzekî çêke. Êdî tû jî dibînî, vaye kêza terecan, ketiyê nava dîza dan û bûye şeq şeq hatiye ber mêvan.

Mişk ji xanî dertê û diçe ser poxanê, ew xwelî bi ser serê xwe kir û giriya.

Nêriyek jî, ji wêde ve tê. Lê rihênt, wa mişk xweliyê bi serê xwe dike.

Nêrî gote mişko:

- Çima tû wa xwelî ser?

Mişk got:

- Pa ez xwelîser, kêza terecan, ketiyê dîza dan, buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Nêrî jî rabû riyên xwe qusandin û çû binê darê.

Darê gotê:

- Nêriyo çima tû wa rîqusîn?

Nêrî got:

- Pa ez rîqusîn,



Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Darê jî rabû pelên xwe weşandin û ew pelên wê ketine ser ruyê avê.

Avê ji darê pirsî:

- Çima tû wa pelweşîn?

Darê got:

- Pa ez pelweşîn,
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
bûye şeq şeq çuye ber mêvan.

Avê jî rabû xwe sorkir û çû ser garis.

Garis ji avê pirsî:

- Avê çima tû sorî weke xwîn?

Avê jî got:

- Pa ez sor weke xwîn,
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Dara me ya pelweşîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Garis jî radibe xwe denixûn dîke (serê xwe dîtewîne).

Xwediyê garis tê nava garis û dibîne ku garis denixwîn e, gote garis:

- Gariso çima tû denixwîn?

Garis got:

- Pa ez denixwîn,
- Ava me ya sor e weke xwîn
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Dara me ya pelweşîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Xwediyê garis jî rabû mera xwe xiste qiwîna xwe.

Gava keçika xwediyê garis taştîya bavê xwe aniye, gotiye:

- Bavo çima tû wa merbiqûn?

Bavê got:

Pa ez merbiqûn,
Garisê me yê denixwîn,
Ava me ya sor a weke xwîn,
Dara me ya pelweşîn,
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terîcan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Keçikê jî rabû mastê ji bavê xwe ra aniye, bi ser serê xwe ve dakir û çû male.

Hinga qîz diçe malê, dayîka wê jî nanê sêlê çêdike û ji keçika xwe dipirse:

- Keça min çima tû wa serbimast?

Keçik dibêje:

- Pa ez serbimast,
Bavê min yê merbiqûn,
Garisê me yê denixwîn,
Ava me ya sor weke xwîn,
Dara me ya pelweşîn,
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Dayîkê jî rabû sêla xwe li qiwîna xwe da û kire hawar hawar.

Dengê wê çû gindiyar. Gundî hatin û ji dayîkê pirsîn:

- Çima tû weha sêlbiqûn?

Dayîkê got, pa ez sêlbiqûn,
Keçka me ya serbimast,
Mêrkê me yê merbiqûn,
Garisê me yê denixwîn,
Ava me ya sor weke xwîn,
Dara me ya pelweşîn,
Nêrî yê me yê rîqusîn,
Mişkê me yê xwelîser,
kêza terecan,
ketiye dîza dan,
buye şeq şeq çuye ber mêvan.

Gundiyan tevan bihevûdinê ra li ser kêzê kirine hawar, hawar û gotin, brawo, brawo !

Gava Xwedê dengê hawar, hawar û brawo, brawoya gundiyan bihîst, ew jî hate hawara gundiya û got, çima ez vê kêza terecan cardinê ranakim. Kêza terecan bi heyîya Xwedê rabû ser xwe û di ber gundiyan de firiya çû ezmanan.

Çîroka me li virê qediya û bila rahma Xwedê li dê û bavên me hemîyan be !

*Birayê Aydın Ronak ev çîroka di roja 07.04.2012 de ji min ra gotiye û min peyv bi peyv ji ber dengê wî nivîsandiye.



Hevpeyvîna **Pênûsa Nû** bi

Abdulrehman Çelîk re

Dezgeha Şanoya Seyrî-Mesel

Di şopa resenatiya kurdewarî de



Dezgeha şanoyê ya bi navê Seyrî-Mesel, li zikakekê nêzîk cada Teqşîm ya binav û deng, ku wek dilê Stenbolê yê dijene tê nasîn, li Stenbolê bi cih dibe. Ev çend salin vê dezgehê xabateke giring di warê şanoya Kurdî de pêşkêşkirîye.

Dezgeha şanoyê ya Seyrî mesel ji bê derfetî û destkurtiyê ji hêla maddî ve, bi kedeke resen li dûrî welat hatiye afirandin.

Giringiya vê xebatê ji vê yekê tê, ku serbixweye û ku kêmnimûneye çî li navçên Kurd lê dijîn li Bakurê Kurdistanê, û çî li bajarên Turkiya yê din ku Kurd koçberî wan bûne. Çünke şano weke huner, û bi taybet şano bi zimanê Kurdî, gelek paşdeye, û xizmeteke giring bo vê beşê hunerê nehate kirin, weke beşeke giring û serkî ji çalakiya mirovan.

Lewma me bi giring zanî em tîşkê bixin ser xebata vê dezgeha hunerî, û bikarin ji nêz ve xebat û berhemên wê bişopînin, û asta ku gihastiyê berçavbikin, ji devê birevebirê dezgehê birêz Abdulrehman Çelîk.

Pênûsa Nû: We kengî dest bi vê xebatê kir û bîroka wê ji ku hat?


Çelîk: Dezgeha me ya hunerê ya bi navê Seyrî-Mesel ê di sala 2002'an de ji aliyê çend hunermend û şanogerên kurd ve hate avakirin. Beriya ev dezgeh bête avakirin, xebatkarên wê kar û barên xwe li Navenda Çanda Mezaopotamyayê didomandin. Ji ber ku êdî nikarîbûn kar û barên xwe li vê saziyê bidomînin di sala 2002'yan de wekî pêdiviyekê biryara saziyê serbixwe ji aliyê van xebatkarên ve hate dayîn û Seyrî-Mesel li dû encama vê biryarê li Taksîma Stenbolê bi keda van kesan hate avakirin.

Pênûsa Nû: Ji bo çî we navê Seyrî-Mesel hilbijartîye bo girûpa xwe?.

Çelîk: Dezgeh di destpêkê de bê nav karê xwe didomand. Me ji xwe re digotdivê em navekî wisa lê bikin ku ji aliyê her kesî ve bête pejirandin û her kesên bi hunerê ve eleqedar karibe xwe di nav de bibîne.



Lewma em gellekî li ser fikirîn, li gel encama vê fikariyê gellek nav bi gellek maneyan li ser hev kom bûn. Xwediyê/a her pêşniyarê dixwestin maneyekê li vê xebatê bikin, lewma di destpêkê de navpejirandin zahmet çê bû. Piştî nixandineke dûve dirêj, Navê *Seyr-î Mesel* li dezgehê hate kirin. Navê dezgehê tam wisa ye: *Dezgeha hunera Seyr-î Meselê*. Tê pirsîn, ka îcar Seyr-î Mesel tê çi maneyê. Ev herdu peyvên ji me re nas û em hertim di jiyana xwe ya rojane de bi kar tînin gava digihîjin hevdu xerîb tê guhê mirovan. Nav ji du peyvyan hatiye çêkirin; lêkera *seyr* û peyva *meselê*. Seyr tê maneya *nerîn, dîtin, temaşekirinê*. Mesel jî tê maneya *gotin, çîrok, vegotin, şîrovekirinê*. Û dîsa mesel di şanoya Brechtîyan de şewaza xebata ji bo destpêkê ye. Her weha Seyr-î Mesel di gelek zimanan de (zimanên wekî tirkî, erebî, farisî, kurdî û hwd.) heman wateyê dide. Lewma ev nav hate pejirandin û reng da dezgehê, da kar û barê xwe bi vê distûrê bi rê ve dibe.



Pênûsa Nû: Ev dezgeha we bi çi çalakiyan radibe, û peyama we çi ye bo xelkê?

Çelîk: Dezgeha me gava hate avakirin ji ber xebatkarên wê şanoger û wêjenas bûn, giranî li şanoyê hate dayîn. Lewma karê sereke yê Seyr-î Meselê şano ye. Bes dîsa jî dezgeh ji bo hemû hunerên kurdî karibin xwe pêk bînin hatiye avakirin. Şano, wêje, muzîk û sînema karên ku heta niha em pê daketine ne. Lewma ji bo van huneran dezgeh hatine saz kirin û gelek kes bi rêya van dezgehan hatine perwerdekirin. Heta niha nêzîki deh lîstikên bi kurdî di vê dezgehê de pîjyane û gihîştine temaşevanên kurd. Konsêr hatine pêşkêşkirin, û piştgiriya sînamaya kurd hatiye kirin.

Peyama ji bo xelkê; em hêvî dikin ku qîmetê hunerê wê bê zanîn û emê serwextî rola hunerê ya ji bo pêşketina milletekî bibin. Em baweriya xwe pê bînin ku huner bi qasî nan û avê ji me re lazim e. Nan û av zikê me, huner jî dil hestên me têr dike.

Pênûsa Nû: Hûn bi çend zimanan hunera xwe pêşkêş dikin? Û pêşewaziya xelkê bo hunera we di çi astê de ye?

Çelîk: Zimanê xebatê yê Seyr-î Meselê **kurdî** ye. Gava em dibêjin kurdî divê herdu zaravayên kurdî (kurmançî û kirmancî (dimilkî, zazakî)) yên ku li bakurê Kurdistanê tene axaftin bê fêmkirin. Seyr-î Meselê heta niha bi herdu zaravayan berhemên şanoyê pêşkêş kirine.

Pêşewaziya xelkê bo hunera me; beriya bi çend salan çêtir bû, gellek kes dihatin temaşeyê, bes van du sê salên vê dawiyê kêmtir bûye. Bi qasî berê bîr û bal nayê dayîn. Hunera kurdî hinekî girêdayî polîtîkayê bi rê ve diçe. Gava siyaseta pêdiviyê pê dibîne, bîr û bal jî zêde dibe, gava pêdiviyê pê nabîne bir û bal jî kêmtir dibe. Lewma van salên vê dawiyê pêdiviya bi hunerê ve hinekî kêmtir bûye. Huner ji bo hunerê naye şopandin, wekî helwesteke polîtîk tê şopandin. Ev jî girêdayî wextê ye. Wê bi wextê têkeve rastiya xwe.



Pênûsa Nû: Hûn hunera şano di van gonaxên dawî de, li bakurê Kurdistan di çi astê de dibînin?..

Çelîk: Li bakurê Kurdistanê şanoya kurdî ev bîst salên vê dawiyê tê kirin. Lewma di navbera van bîst salan de şano gellekî bi pêş ket. Êdî ecemîtiya wan salên destpêkê nemaye, şanogerên profesyonel der hatine. Şanoya kurdî êdî bi her awayên xwe bi profesyonelî der tê. Di destpêkê de şano li Stenbolê dihat kirin. Yanî em dikarin bêjin ku navenda şanoya kurdî Stenbol bû. Bes niha van salên vê dawiyê Şano li Amedê jî pêş ketiye. Bi derfetên Şaredariya Bajarê Mezin Ya Amedê şanoya kurd merhaleyeke xweş derbas dike û hêviyê dide pêşerojê. Lê dîsa jî em dikarin bêjin ku komên serbixwe ji piştgiriya bêpar in. Ev rewş di pêşerojê wê komên serbixwe lawaz bixwe û ji holê rake. Loma xetereyeke nedîtî li pêşiya şanoyê ye. Divê em balê bikişînin ser vê rewşê jî.



Pênûsa Nû: Asta pêwendiyên we di gel dezgehên şanogeriya li beşê din yê Kurdistan çawa ye, û ji bo geşkirina pêwendiyên çî pîlanên we yê paşerojê hene?

Çelîk: Mixabin heta niha tîkiliyên me bi beşên din ên Kurdistanê gellekî qels hatine danîn. Beriya pênc salan di sala 2007'an de em carekê derketin turneya başûrê Kurdistanê. Me li Dihok, Hewlêr û Silêmaniyê lîstik pêşkêş kirin û hew. Careke din derfetên me çê nebûn em derkevin turneyê. Ji wir jî tîkîlî nayê dayîn. Sînorê di nav me, sînora datine ser tîkiliyên me jî.

Em nikarin bêjin me ji bo pêşerojê plan çê kirine ku em pêwendiyên geştir bikin. Lê baweriya me ev e divê platformek ji bo şanogera bête avakirin. Divê şanoger û hunermend hevdu nas bikin û ji hunera hevdu agahdar bibin. Ji bo vê yekê jî dezgehên xurt divên dest bavêjin vê meseleyê.

Mizgîn Hesko

Mijdara2012-an

Rûbarên havîbûnê

Ji bo Serê Kaniyê û
xelkên me yên rojavayê dil.



Li wir
Li Waşo Kanî
Dîrok...
Dilekî spî
Vekirî
Û merdan e
Berbi min ve dihat
Û berbi dîrokê ve
Pênûseke tevîzî
şikestî
Û lal dimam

Li wir
Li Waşo Kanî
Baxên heşîn
Werzên rengereg
Û xemrevîn

Û li vir
Li Serê Kaniyê
Heman...bax...şewitîn
Û werz jî perpitîn.

Li wir
Dîrok...
Bi rûkenî
Bi dergehên xwe yên
Bilind û fereh ve
Xirecira karwanan
şahîna hespan
çinge çinga şûr û mertalan
Mîtanî... û serwerî.

Û li vir
Xencerên ji kalanê
Û kuh....
Min....
Marmasiyên xwe
Serjê dikirin
Min...
Rûbarên herikbar
Bê kêr dikirin.
Û her pênûseke
Bê ser û ber
Bê hûde....dimam
Xêzên min î tam xav
Dê....
Têra zikekî birçî
Ne kin

Rûpelê min î şilo pilo
Û dagirtî giryan
Dêêêêêêê.....
Bedena sêvzarokê hilweşiya yî
Û li jêr dara bêbextiyê
qufilî û sêwî mayî
Germ ne kin

Dê hemî raman
Têra ...bêzarî
bê xewiya
û bê hêziya
dîwarên hêrivî
yên gund û şarên min
ne kin.

Li vir
tilyên min î destekî
Û ne bi destekî
Dê hêsirên
dî çavên dayika min de
Zuha ne kin

Dê şilêran
di qermîçokên riwên melûl de
Ve ne kin
Dê çiradankan
di şevzivistanên
tarî de
Vê ne xin

Êdî bese
De ji hezkirina min
Bi west e.
U destên xwe
Ji şûna lêvên min
Ji bîna henasên min
Ji şopika maçên min
Bi şon e.

Min tu
Di nav diranên gurên dubirak de
Bi tenê hêêêêêêla
Û min evîna xwe
Dilsoziya xwe
Li te xiste bar
Û dilê te
Pê werimand...

Lazgîn Dêrûnî

lazgin60@gmail.com



EY ŞÊRÎNÊ

Ey şêrînê nazelînê
Nû ciwanê gula zînê
Sorgula baxê evînê
Lêv şekirê rû befirê
Min di kujê bi awirê
Qey ti halê mi nabînê
Kezî marin tijî jehrin
Li ser mila ber bi xwarin
Ewin dermanê birînê
Du çavê reş zimanê xweş
Dil aşiqê wî riwê geş
Memê teme were zînê
Gulîzerê rû fenerê
Weke rojê di dê derê
Bejna zirav dihejînê
Xeşmê neke zû dil veke
Barê xema giran neke
Çima wilo li min dînê
Bersiv nadê bê miradê
Ji min sile perîzadê
Dil û hinav disotînê
Ketim davê dikim lavê
Benda veke gawir bavê
Mi hêz nîne bi qetînê
Çare nîne dil evîne
Şev û roja mi xew nîne
Te bernadim xemrevînê
FERHAD kanî wî zemanî
Neqşû huner bi arzanî
Can fîdakir ser şêrînê
SIYAMENDÊ XEC li bendê
Bo xatirê çavê rindê
Di gevîzî li nav xwînê
FEQHÊ teyra mabû heyra
Li ber avû çem û behra
Wê dîlberê wê evînê
Gelek mirin lê ew pirin
Can li ser dîlbera kirin
Di vê rêde bi vê şînê
Neçêtirim ez bimirim
Wekî teva ez bawerim
Nav û dengê min bimînê

Hevpeyvîna **Pênûsa Nû** bi **Rûsîpiyekî Êzdiyan** re

Di hevpeyvîna bi rûsîpiyekî Êzdiyan de gelek zilm û zora ku Dewletê
û kevneperestên Kurdên bisilman li Êzdiyan kirine eşkere dibin.

Hevpeyvîn: **Kemal Tolan**



Desthilatdarên dewleta Osmanî belge û agahiyên êrîşên ku kevneperestên Kurdên bisilman anîne ser civaka Êzdiyan, bi sed hezaran Êzdiyên bê sûc û gune bi darê zorê qulibandine ser dîne xwe û qirkirine, tevaya mal û milkên Êzdiyan li ser navên xwe çê kirine, ji bo armancên xwe yê qirêj, tev ne xistine nav arşîva desthilatdariya xwe.

Min jixwe ra got, ji bo em nakokiyên ku neyaran berdaye nava dilê gelê Kurd nasbikin û ew dîroka xayîntiya derbasbuyî di pêşerojê de jî cardinê dúbare nebe, divê em Êzdî hemû agahiyên, zilm û zora ku Dewletê û kevneperestên Kurdên bisilman li pêşiyên me kirine û gelek ji wan buyeran li sersinga rûsîpiyên me veşartî mane, ji nav zargotina civaka xwe tomarbikin.

Lewma jî, ez di 04.08.12 de çûme mala xalê **Ahmedê Silêman(Acar) yê ku li bajarê Celle dimîne**. Min gotê Xalê Ahmed, tû weke rûsîpiyekî me Êzdiyên ku ji bakurê Kurdistanê hatne, tîyî naskirin. Tû dikarî ji kerema xwe ra, bahsa hinek buyer û zilma ku Dewletê û kevneperestên Kurdên bisilman li me Êzdiyan kirine bikî?

Camêr, xalê Ahmedê Silêman(Acar) destpêkir û got, „Pêşiyên me ji me ra timî digotin, berê deşta Silopiya tev li ser navê şêx Silo dihate naskirin û lewma jî navê vê herêma Kurdî buye Silopiya.

Silo, şêxê Hesinê Hewêrî(Şeref) û yê tevaya eşîra hewêriya bû. Zozanê Sêdanê(Yanî li aliyê herêma Hekariya, devera ku meriv sê dana lê diçe bêriyê û pez lê didoşe re dêjin) tev di bin destên Hesinê Şeref de bûn.

Rojekê mîrekê Bota yê bi navê Nasir, di qesra xwe de dêje Hesinê Şeref (Hewêrî): Hesin bi Xwedê, ez çiqas li virê ji Xelefê Şûvî ra dêjim, dive tû jî bêş û tara xwe bide, ew dêje başe, ezê bidim. Lê wexta Xelef diçe malê û xwilamên min ji bo komkîra bêşê diçine balê, ew li xwilaman dixê, dêje ez nadim û dûre jî xebere ne baş ji bo min dêje.

Hesinê Şeref dêje, mîrê min, bi Xwedê axa wî ji ya te mîr tir e.

Mîr Nasir bi ser Hesin de hêrs dibe û dêje, axa ku ji axa min mîrtirbe li kurê heye?

Hesinê Şeref cardinê dêje, mîrê min, ne xeyide, wele axa wî ji ya te mîr tir e. De ka tû here kulmek axa ku ew li ser dijî bîne û di qesra oda xwe de tîxe bin doşeka ku Xelef li serê rûdinê. Hingê tû bivîni ku ewê di mala te de jî bêje, ez tu bêş û tara nadime te. Û gava ku ev gotina mijî rast derneyê, hingê tû zanibî ez ne Hesinê Şeref im!

Mîr Nasir dêje Hesin başe, bi ad ezê niha bikim ku xwilam herin, hinek axa wî bînin û xwilaman diçine hinek ji axa wî tîne. Dûre weke ku Hesin gotî, wê axê di qesra oda xwe de dixê bin doşeka ku Xelef li serê rûdinê. Gava Xelefê Şûvî cardinê hate qesrê û li ser doşekê rûnişt, mîr Nasir dîsa dêje, Xelef divê tû bêş û tara xwe bidî.

Xelef ji ser doşekê rûniştî dêje mîr, ma tû Xwedayê min î, ezê çima bêş û tarê bidime te? Wele, ez yek qurîşekî bêş û tara na dime te.

Mîr deyn nake û Xelef radibe ji qesrê dertê û diçe.

Dûre mîr Nasir dêje Hesinê Şeref, bi Xwedê, tiştê te gotî tev rast derket. Lê, ez dixwazim tû Xelef bikujî.

Hesinê Şeref dêje mîrê min, em bi ber kêmbûnê ve diçin û bi Xwedê, ez Xelef nakujim. Xelef tû xirabî bi min nekiriye.

Mîr Nasir hew bersivê dide Hesinê Şeref. Lê, dûre xeberekê ji Îsa yê kirivê xwe yê xwînê, ku li bajarê Cizîrê dima ra diçine û dêje, Îsa gava Hesinê Şeref vîcarê hat li qawê rûnişt, tû jahrê berde nav fîncana Hesinê Şeref û bila ew pê bimire.

Gava meriv vîga jî li vî kilama ku li ser Hesinê Şeref hatiye gotin guhdarî bike, ev buyera tî de jî xwanê kirin.

Strana Hesinê Hewêrî

Eyşê dibê; lo lo bavo !

ezê bi deşta Cizîrê wê de hatim,

gelekî berî erde.

Tê rabe Xezalê ji tewlê bikşîne,

Zînekî zerî Êntabî li ser piştê bi edlîne,

Piyê xwe bavêje rikêbê û dest bavêje dezgînê,

serê Xezalê lê berde.

Êzê bala xwe didime, zozanê jorîn

Zozanê li pişta Wanê û deşta Silopiya,

piştî Hesinê Hewêrî, bavê Evdo û Dolme

Konreşî ji min re buye kul û derde.

Eyşê dibê ; lo lo bavo !

Zozangera zozanê xwe çêrandin,

Xanberindirê bavê Evdo û Dolme

li deşta Silopiya û li navrûya Şêwruyê

dûvê xwe gerandin.

Kula Xwedê bikeve mala Îsa û Mûsa Ciderî

Çewa li xopana Cizîrê bavê Evdo û Dolme,

bi fîncanê jahrê bihecandin.

Piştî bavê Evdo û Dolme,

Konreşî ji me malê Hewêriya re herimandin.

Ezê dibêjim :

Konê bavê Evdo û Dolme, konekî reşî erebiye,

Ruh reş û ruh spî yê Bota, li binê de rûniştine,

Şêwra kuştina bavê min danîne.

De piştî Hesinê Hewêrî, bavê Evdo û Dolme

Zozanê jorîn, zozanê pişta Wanê û Deşta Silopiya

konreşî ji me malê Hewêriya re herimiye.

Ezê dibêjim :

Konê bavê Evdo û Dolme,

di nav êlê de konê reşî herî mezine,

Ruh reş û ruh spî yê Bota,

li binê de sekinîne û rûniştine,

Kirine qal û bala kuştina bavê min e.

De piştî bavê Evdo û Dolme
Konreşiya li Zozanê jorîn,
li zozanê piştî Wanê û Deşta Silopiya,
li min heram be, bive goştê canê min e,
lo lo bavo , lo bavo*

Her weha dîsa, gava şêxekî me Êzdiyan, yê li deşta Silopiya şivanî dikir, ji ber pez tê malê, pîreka wî jê ra dêje, bi Xwedê piçek sabûn û xwê di nav mala me de ne ma ye. Divê tû herî bajêr, kîloyek sabûn û hinek xwê ji ma ra bînî. Şêx dêje jina xwe, keçê Xwedê mala te xirane kirê, ne tû dizanî van rojan şêxekî bisilman di herêma me de hatiye kuştin û bisilman dêjin ku Êzdiyan ew kuştîye, ezê çewa di vê rewşa dijwar de herime bajêr.?

Şêxê me dike û nake, hevsera wî dev ji daxwaza xwe bernade. Şêx radibe bi dizîka tê Şirnexê, xwe di gihîne dikana dostekî xwe yê bisilman. Gava mîrikê dikandar şêxê me nasdike dêjê, kuro Xwedê ji te sitandiye, ma te ne bihistiye ku bisilman li we Êzdiyan digerin û te çewa cesaret kiriye werî vêderê?

Şêxê Êzdiyan dêje yê dikandarî, ez ketime ber bextê Xwedê û yê te, tû yê hinek sabûn û xwê bidîmin. Ezê cardinê bi dizîka ve gerime gundê xwe. Dostê şêx pêdiviyên vî didê, şêxê me radihêje xwê û sabûn xwe vedigere. Wexta ew tê li ser pira Cizîrê, hinek bisilman wî nasdikin ku ew Êzdiye û êrişî ser wî dikin.

Şêxê me jî di vê tengasiyê de hawara xwe digihîne Şêx Mendê ku ew ocaxa pê nasdike û dêjê, ya Şêx Mendo tû va dibînî, êdî tû min ji ber destên van zaliman xilazke, eger tû min xilaz nekî, bi Tawisî Melek ez hew li pey te hatim! Ya min û te jî ev kêliye !

Herdû kesên bisilman gihîştine şêx û ew zeptkirin. Yekî gotê yê dinê, de tû bi herdû milên wî bigire, ezê bi bi vî balteyî serê wî bipekînim û heyfa şêxê xwe ji vî hilînim.

Gava yên bisilman Şêx zeptdikin, Xwedê ti ala wisa hizdike, ji batinî ve milên wan sist dibin û şêxê me dikare xwe ji nav lepên wan xilazbike, direve û tê xwe digihîne malê. Hinga ku Şêx tê malê, ew mesela ku Şêx Mend wî bi batiniya xwe ji kuştinê xilazkiriye dêje hevser û gundiyan. Dûre diçe Lalişa Nûran î û ew li ber mala Şêx Adî kirasdiguhêze.

Mahneya şêr ketiye nav dahlê çiyê?


Di wextakî de mîrekî bisilman, yê ku simbêlê wî gelekî bedew û dirêj bûne, bi gelek siwariyên xwe ve li maleke axayê Êzdiyan dibe mîvan. Axê Êzdî rûmeteke mezin, vexwarin û xwarineke zahf giran buha tine li ber mêvanên xwe datîne.

Mêvan dest bi xwarinê dikin û ew di ber xwarinê de dibîne ku piçîkek hestî, yê di ber pijandinê de reş buye, di nav simbêlên mîrê bisilman de maye ahsê. Axa ji xwe ra dêje, ez vêga rabim mîr di nav vî civata wî ya mezin de bidime şermê, ne başe.

Axayê Êzdî li mîr dinêre û dêje mîrê min, şêr ketiye nav dahlê!

Mîr ji gotina axê Êzdî fahm nake.

Axayê Êzdî cardinê dêje mîrê min, şêr ketiye nav dahlê û destên xwe li simbêlên xwe dixê!



Mîr, êdî fahm dike û destên xwe davêje simbêlên xwe. Gava li nav destên xwe dinêre, hestiyê ku bi simbêlên wî ve mayî dikeve nav lepê wî. Mîr piştî xwarinê dêje axê, spas ku te min şermekar nekir.

Dûre hinga ku mîr vedigere tê cîhê xwe, ew gazî hemû keşe, mele û feqiyên di nav herêma xwe de dike û dêje wan, ka kî ji we dizane ku mahneya şêr ketiye nav dahlê çiyê?

Yekî ji wan jî nikarîbuye bersiva pirsê mîr bide.

Mîrê bisilman dêje wan, bi serê bavê min, we ji xeynî derxistina fetwa kuştina Êzdiyan, wekî dinê tu tiştê ji xutba sosyal û civaka Êzdiyan ji xwe ra ne girtiye.

Xalê Ahmed, tû çima û ji ber çi hatî Almanya?

Bi rastî, ez ji ber tûneya malê dinê û tahdeya ku, di derdora me de li me Êzdiyan dibû,

Êzdiyan dibû, reviyam hatime Almaniya yê. Zahmetî û neheqîya ku me Êzdiyan dîtîye, tu kesekî ne dîtîye.

Me ji ber zordestî û neheqîya dewletê û kevneperestên Kurdên bisilman, nikarîbû herine pey qewlbêjekî bînin nava xwe û me gelek caran miriyên xwe bê amadebûna dînavêkî Êzdî binax dikirin.

Me ji ber zilma dînî nikarîbû herin, ji gund û bajarên li derûdorê hebûn, pêdiviyên nav mala ji xwe ra bînin. Gava me barek dirik dibire Qubînê, difirote 2,5 baqnotan, anjî barek zad dibire Heskîfê, heta em ji nav bajêr derdiketin, bajariya hezar carî bi dîn û îmana me xeber dikirin.



Xalê Ahmed, tû dikarî ji kerema xwe ra, niha bahsa hinek buyer û zilma ku Dewletê û kevneperestên Kurdên bisilman li me Êzdiyan kirine bikî?

Mînakên ku dewletê û kevneperestên Kurdên bisilman, êriş anîne ser civaka Êzdiyan, bi sed hezaran Êzdiyên bê sîc û gune bi darê zorê qulibandine ser dînê xwe û qirkirine, tevaya mal û milkên Êzdiyan li ser navên xwe çê kirine, gelek in û gelek ji hew tene bîra min jî.

Tiştê ku min ji rûspyên me Êzdiyan (yên mîna Berkatê Mamed, Emerê Mihemed û hwd.) bihistiye û bavê min digot:

Di zemanê kevn de, heçî mîr qismî di bisilmanan de tûne bûne û çî kesê ku bi mîrantiyê hatine naskirin jî, pêşiyên wan tev Êzdî ne. Piraniya pêşiyên mîrekên herêmên Kurdistanê û welatê derdora Kurdistanê, tev ji bine mala mîrên Êzdiyan, yên ku piraniya wan desthilatdarên Mezopotamiya yê (Xoresanê, Tebrêzê, Çolemêrgê, Wanê, Amedê, Kilîsê, Mîr Birahîmê, Mîr Mihê û hwd.) bûne. Ev rastî û bîngêh vêga hêjî di nav gelek lawij û efsanên di nav zargotina me Êzdiyan de hatine parastin de xwanêdikin.

Dewletên dagirker nikarîbûn wisa bihêsanî bikevine nav axa Êzdîxanê û herêmên ku dagir kiribûn jî bawerî bi Êzdiyan ne dianîn. Lewma jî, di gelek deman de Êzdî ne dibirine xizmeta leşkeriyê. Lê di şûna ne birina leşkeriyê de, gelek pere û mal ji yên ne bisilman û Êzdiyan distandin.





Rûspiyan me digotin, rojekê hinga Feqîr Şekîrê Kalo, bavê feqîr Hisî û Berkata diçe aşê gundê Dêravê. Hinek bisilman tîn dikevîne pêşiya Feqîr Şekîr, wî dikujin û kevîran davêjine ser dilê Feqîr. Gava Êzdiyên gundiyan Bazîwanê kuştina Feqîr dibihîzin, diçin termê Feqîr tînin û wî li gundê Bazîwanê bin ax dikin

Mamedê Temo*, rojekê ji bo hinek pêdiviyên rênber û mala xwe bîhne cîh, çend barên ceh û genim davê je ser piştê hespan û di nav çiyayê Xendeqîyan de, bi piya diçe Heskîfê. Gava digihîje Heskîfê, hinek bisilman wî weke Êzdî nas dikin, çêran(peyvên ne baş) bi wî dikin û dêjinê, eger tû vêga eşeda xwe li ser bisilmanetiyê neynî û vê xebera ku Êzdî jê acisin ne bêjî, emê te bikujin.

Mamedê jî dêje bisilmanan, welehî hûn min vêga bikujin jî, ez vê vê xebera ku Êzdî jê acisin nabêjim û bila serê min jî seriyekî di rehîna dîne Êzî de be, Hole hol hola Êzîde sore!...

Yên bisilman Mamedê Temo didine berxe û, wî dibîne ser serê kela Heskîfê . Li serê Kela Heskîfê dîsa dêjinê, tû dibînî , eger tû vêga jî eşeda xwe li ser misilmanetiyê bîhnî û vê xebera ku Êzdî jê acisin bibêjî, em te li virê serbest berdîn. Lê, Mamedê Temo dîsa bi ya wan nake û dêje wan, bila serê min jî di rehîna dîne Êzî de be, Hole hol hola Êzîde sore.

Êdî bisilman dest û lingên Mamedê Temo bi werîsan girêdidin û wî bi ser serî ve di zinarê kela Heskîfê de berdine xwarê.

Di peyra hinga hinek dostên Mamedê Temo, vê buyera wî dibihîzin, ew diçin laşê Mamedê Temo tînine gundê Şimzê. Bavê min digot, gava me Mamedê Temo wisa birîndar dît, bîhna wî hima hindikî derdiket û kesî bawer ne dikir ku, êdî Mamedê Temo cardîne rabe ser xwe. Lê Xwedê bi hawara wî ve hat û ew piştî demekê dîsa hate ser hişê xwe.

*Mamedê Temo, Êzdiyekî ji gundê Şimzê yê gelekî mal û nandar bû. Ji ber ku pez û dewarên wî hingî zahfûn, wisa jî gelek renber û cotkaran bi xêra wî debara mala xwe li ser hebûna wî dikirin.”

Min dîsa ji rûspiyan bihîstiyê û dizanim ku:

Mîrzayê Biro, yê ku ji eşîra Xendeqîyan bû, li çah meman ya ku di herêma gundê Şimzê de ye, - Ozmanê Soro, bavê Şikriyê ku li gundê Feqîra dima jî, li çah ba gundê Barisilda - Reşîdê Mamed û Birahîmê Mîrzo, yên ku mala wan li gundê Hemdûna bûn,- dû pismamên me yê bi navê Emer û Silêman ji gundê Heznamîrê ev tev bi destên Kurdên bisilman hatine kuştin. Dîsa birayekî Xelefê Dûşayî yê bi navê Reşê,- birayê Silêmanê Seyro yê bi navê Mahmud ji gundê Bazîwanê, ji gundê Qorixê Bişarê Seyro û ji gundê Çinêriya Filîte Kemo bi darê zorê bi xwe ra biribûne “herbê” û ew jî venegeriyane mala xwe.

Her weha serok eşîrên Kurdên bisilman, gelek jinên Êzdiyên jî bi dare zorê revandine û bi wan re zewicîne. Ji xwe herkes pêşiyê xwe nas dike û pêwîst nake ku ez wan tevan li virê binav û birêzbikim.

Welehî neheqîya hinekan ji wan, li vê Almaniya yê jî li ser me berdewam dike. Vaga li virê jî hinek ji wan nahêlen ku meriv li goriya nêrîna xwe bawer bike û bixebite. Gelek caran astengiyan ji me ra çêdikin û dêjin, “divê hûn weke me bikin”.

Xalê Ahmed, wexta ku tû di sala 1973 de hatî Almanya yê pêve, te bi neferên xwe yên li welat mabûn re çewa pêwendî dikir?

Di wan salan de pêwendî tenê bi nivîsandina naman hebû û ji ber ku xwandin-nivîsandina min jî tûne bû, hinek camêran ji min ra namên min dinivîsandin.

Min ji ber nexwandinê gelek zahmetî li ser kar jî didîtin û lewma min xwast ku zarokên min bixwînin.

Xalê Ahmed, gava tû hatî Almanya, hingê te dixwast çend salan û pêve vegeerî welat?

Bi Xwedê min dixwast, gava ku ez perê deynên xwe bidimhev û dûre bikaribim dû gahên cot ji xwe ra bikirim, hingê vegeerime welatê xwe. Min nizanî bû ku, ezê hewqas zêde bimînim, wê zarokên min li Almaniya bivine xwedîpîşe û wê xaniyên min li Almaniya çêbivin.

Xalê Ahmed, te li Almanya yê zahmetî û zordarî kişandiye ?

Ji xeynî hinek zahmetiyên ne zanîna zimanê Almanî, wekî dinê min tu zordarî nedîtiye û tu kesekî jî zilm li min ne kiriye. Di vî 42 salî de, min ne dîtiye ku kes ji kesî xeber daye û zordariya baweriyê li kesî kiriye.

Xalê Ahmed, weke ku ez dibînim, tû ji welat bêtir li Almanya jiyayî dikî, li goriya dîtina te kîjan welat ji te ra xweşe li almanya weke welatê xwe dihesibî?

Erê wele, ez eva 42 salan li vê Almaniya yê dijîm û ji aliyê dîne ve jiyana li Almaniya gelekî ji ya welatê me xweştir e.

Bi Xwedê, ji ber tîrsa tahdeya dîne a ku li welat li me dibû, me Êzdiyên ne dixwastin ku keçikên me li vê Almaniya jî herine dibistanan bixwînin.

Mînak:

Gava qîza min, di xwandina xwe ya li bajarê Celle de serkeftî derket, ewê xwast ku here li derveyî bajarê Celle xwandina xwe berdewam bike û got bavo, tû bizanibe, eger ez heta vêga di nav bajarê Celle `ê de baş bûm, hinga ez herime devereke dinê jî, ezê dîsa wisa baş bim. Anjî gava ez ne baş bûma, min dikarî bû di vî wextê dibistana xwe a Celle`ê de jî ne baş bikirina. Ez dîsa jî hîna gelekî ditirsîyam û ez çûm bi çend camêrên mîna Mehmed Tolan û Hasan Yazgan re şewîrîm(wa şikir ew jî hêja saxin..). Mala wan ava, ewan jî piştgirî da xwandina qîza min.

Vêca bi Xwedê, eger em li welatê xwe bûna wê zarokên me Êzdiyên jî, wekî me nikarîbûna di nav welatê xwe da bixwînin û ewê jî bindest bûna. Êdî, ji ber gelek egerên weha dêjim, jiyana li Almaniya yê gelekî ji ya welatê me xweştir e.

Xalê Ahmed, tû ji zarokên xwe memnûnî, ew li te dipirsin, bi ser te ve diçin û tû?

Belê el hem dila , zaruyên min tev zewicîne. Her yekê ji wan xwediyê pêşeyekî ne. Rewşa tevan jî baş e. Ez ji tevan jî gelekî memnûn im, tev jî tûn li halwextê min û diya xwe dipirsin û gava em bixwazin bi me ra alîkarî dikin. Ji xwe li goriya baweriyê me, gava ku zarokên min ne baş bin , divê ez xwe ji Xwedayê xwe nekim û bejim, ew ne başin û guhnê wan jî ne xime stuyê xwe..

Xalê Ahmed li gor dîdina te, tû yê heta çiqasî li vî welatê Almaniya bimînî anjî tû dixwazî rojekê bi temamî vegeerî welatê xwe?

Bi Xwedê, vegeerî ku em vegeerî welat hêja ne xwanêye, çûnkî welatê me niha xirabûye û kesekî me li welat ne maye.

Încar kîjana qenc be, bila Xwedê û xasên Êzdiyên ji me Êzdiyên ra bişînin. Em Êzdî gelekî rebenin û welahî nakeve serê min ku em rojekê bitevayî vegeerî welat. Di dinayê de kesekî weke me Êzdiyên bê welat û hêjar ne mane. Eger ez vêga vegeerim, ka ezê herime kuderê? Cîh û milkê me yê ku li Batranê hebû, xelqê ew jî ji me standine û êdî ne yê me ye.

Xalê Ahmed, tû bawerdikî gava meriv li xerîbiyê be, meriv zêdetir nexweş dibe ?

Welehî gava ku li welatê meriv azadî hebe û tahdeyî li kesayeta meriv nebe, meriv tenê wê axa welatê xwe bixwe, dîsa jî ji derketina xerîbiyê çêtîre. Rojek ji jiyana li welat, beramberî ya meheke vê xerîbiyê ye.

Xalê Ahmed, çi ji jiyana welat a xweş tûye bîra te û te herî zahf bêriya çî welat kiriye?

Hewa, ax, av , nan... hima her tiştê jiyana welatê me xweşe û tev jî ji bîra min naçin. Lê ez çibikim jê, aramî û azadiya li vî welatê Almaniya li ser wê ax, av û nanê li weltaê me ye tûne. Lewma jî em li vî welatî mane.

Welehî aveke ku jêra dêjin, kaniya kevîr li gundê Baximzê heye, ku meriv di vî germaya nivê havînê de zebeş berde nave, wê ew zebeşê ji ber cimidandina avê bive tûzî, tûzî û şeq. A ev av tûcarî ji bîra min na çê û ez vêga jî bêriya wê avê dikim.

Xalê Ahmed, mesele tû niha vegeerî welatê xwe, tû çi dixwazî li welatê te hebe û tû çi dixwazî bikî ?

Ne min got, ji min be ku di welatê min de zilmî tûne be , aramî-azadiya kesayatiya endamên her civak ligoriya bîr û baweriyê wan hebe .


*Kemal Tolan-Hebûn û Tûnebûna Êzdiyên Tev Romanên Zindîne-Weşanên Han-Grafik, rûpel:86-87

F. Yakoub Bê Te



Barî Teyfûrî

Ey mirovên vê dunê



Bê te ez mame tenê
 Bûme wek dara bê av
 Gul û beybûn çilmisîn
 Ji wa nayê bêhna gulav
 Ez bûme tayekî qels
 Weke tayê xav
 Bê dîtina te jîn nîne
 Hecar û hergav
 Jiyan li min tehil bûye
 Tehile wek zirav
 Ji axîna dîtina te
 Êş dide dil û hinav
 Ji ahîne bê çare me
 Ev dil maye bê lixav
 Li ser rê winda me
 Nema nas dikim hindav
 Li ser rêka evînê
 Bûme dînek destbelav
 Rê dûre şev tarîne
 Roj li min dikin tangav
 Sebr û aramnemaye
 Vî dilî kir me bêgav
 Li ser min ewrê reş
 Kengî li min dibe tav
 Derenge dem hatiye
 De rabe bike çargav
 Herkes li ser piyaye
 Tu weke gola pingav
 Va dinya li min beşîşî
 Carek tu bike silav
 Bi wa tilîyen xwe yê naz
 Can bike hengav
 Gava çav te dibînin
 Ji ziman nayê zarav
 Erd û asman vedibin
 Ji ewra dibare xunav
 Gul û sosin şerm dikin
 Gava tê bejinzirav
 Lêv dikenin dil jê ra vebû
 Bûye wek delav
 Pir westiyî û bi têhn
 Ji vedixwe mina av
 Li deşta evîna te
 Dikim qoşme û çargav
 Were em azad bin
 Li ser erda kal û bav

Ey mirovên vê dunê,
 Dest berdin ji kîn, şera,
 Dûr herin hûn ji kîn ê,
 Wekhev bijîn bi hevra.

Hevra bibin pişt, teyax,
 Hevdu nekin belengaz,
 Mafa nekin teng, yasax,
 Bijîn kubar serfiraz.

Hevra bibin xûşk bira,
 Dest bidin destê hevda,
 Rê nedin hov kujera,
 Hilşînin xwîna evda.

Çavê we qe nebîne,
 Mirin kuştin û xwînê,
 Xirav nekin vê dunê,
 Unda nekin evînê.

Dunya mala hemûyan,
 Bese hev bikin cuda,
 Zulmê hingavt ev cîhan,
 Hev nekin înkâr unda.

Ev çi top, tang û cekin,
 Bese hevra şer nekin,
 Ji zulm zorê vekişin,
 Dijî hevdu nemeşin.

Nehêlin biqewmin şer.
 Mirov nejîn derbeder,
 Dunya me dikin par- par,
 Nava hevda koledar.

Ey mirovên dunyayê,
 Hevra nekin şin, wayê,
 Sinora bese rakîn,
 Hevra werin tim rayê.

Mirov hemû birane,
 Zulm û zor çirane.
 Bê aşîti ev cîhan,
 Tar û mare wêrane.

Rê nedin kujer, hovan,
 Ku bukujin mirovan.
 Bi wekhevî, biratî,
 Hevra bidin silavan.

Yên mirovahîyê der,
 Kesan dikin ji çi der.
 Dunya kirin beş, sînor,
 Yên bê wîcdan û rêder.

Dunya mezin bê bin ser,
 Kirin par-par yê xweser,
 Wanra cîhan tim tenge,
 Gela dikin penober.

Dunya rengên cindîye,
 Kî nezane gundîye,
 Qurne, dewran tîn diçin,
 Ew tim nûye zindîye.

Her kes tê wedelî ye,
 Ji derda ne xalî ye,
 Emrek têra me nake,
 Em çi dikin nivcî ye.

Ey mirov deme rave,
 Dunya me xirav dive,
 Dijî pîsyê bisene,
 Dunya bi te yê şênve.

Kî naha paşda mave,
 Qismetê wî tim xave,
 Ku tu herî demêra
 Ser te hertim yê tav ve.

Dijîn rezîl
 Yên bê resen, kole, dîl,
 Ken qe nayê rûyê wan,
 Jine wana dike şîl.

Kî ku yekser raneve,
 Dijî zorê nesene,
 Nagêhije tu armanca,
 Lewra ew bê resene.

Neyar rabûye ser gel,
 Jina wî ya dike del,
 Ber vîna gelê min,
 Dunya jî maye metel.

Cîyê ku yekbûn heve,
 Zulm- zor ser nakeve,
 Armanca millet eve,
 Dawîya neyar reve.

Ey mirov bese rabe,
 Nehêle dunya xirab be
 Dijî zorê raweste,
 Cîhan bila her şabe.

Azad Mousa

azad.maf@hotmail.co



Xanima bi çar keziyan

Di nav min û wan çar kezyên tede
 Çîroka şaristanya min
 Hatiye wînda kirin ..
 Di nav min û wan de
 Çîroka hebûna min
 Hatiye wêran kirin ..
 Lê ez nizanim
 Ne ez dinav wan de *bişaf bûme
 Û ne ew di dilê min de bişaf bûne ?
 Xanimên xelkê tevde bi kezîkê ne
 Lê tu bi tenê bi çar kezya ye !
 Cihêbûna wan bi xewnê dîna ve
 nehûne
 xanima min
 Çir go :
 bi damarê dilê min re hatine hûnan din !
 di nav min û her çar kezyên tede
 dîroka bêcîrya zimanekî
 hatiye peyda kirin
 û çiroska şoreşa min û te
 bi wan re
 roj bi roj tê hûnan din ..
 û roj bi roj
 ew çirosk bêtir tê xuyanî kirin ..
 di nav min wan çar kezyên te de
 qada cengekê şewatker û mezin
 hatiye amade kirin
 û hêviya min bi rêzgarya te
 xanima min
 hatiye bawer kirin
 di nav min wan çar kezyên tede
 dîroka fîpên zimanê kurdî
 bûye helbest û sitran
 û li ser gewdê bedirxaniyan
 ferheng hatine kolan ..
 di nav min û wan kezyan de
 Çîroka şaristanya min
 Hatiye wînda kirin ..
 Di nav min û wan de
 Çîroka hebûna min
 Hatiye wêran kirin ..

Basîl Hussên

Taristan

rûdêmên çehre reşiyê xwiya dîkin
 liser eniya teyî kej de
 dilopên perîşaniyê
 jê dibarin
 li ser mijgûlên bermayî xemsar
 dirêjin
 di şeveke taristan de li bextê xwe
 digirim
 belkî bi ser omîdên kuştî ve
 bibim
 di navenda deryaya xêw de
 aram bibim
 di kunca ejderekî har de
 niştêcî bibim
 welatê xwe yî dagîrker di mitîngeheke birçî de
 ava bikim
 bajarê xwe li ser hîma navenda erdhejekê
 deynim
 kolanên sar ji şev tariyê
 ronî bikim
 asîman ji tevniqa pîrhevokeke bê tevger
 bihûnim
 çemên jiyânê ji barana saleke zuhayî sar
 biherikînim
 ajalan ji cûreyên kelax kirî
 peyda bikim
 di daristaneke bê çawîr de
 çêriyê bikim
 di goleke serû erd ve
 avjeniyê bikim
 di çavên min î xemûrî de wêneya
 bikêşim



Azad ramadan

aand2011@gmail.com

Qîzka gundê min

Qîzka gundê min şêrîne çî nazik û nazêlîne
 Dema go ez wê dibînim ew canê min dihelîne
 Ey şêrînê lê esmerê lê delalê kezî zerê
 Were li ba min ti rûne melûl bike vê kederê
 Evîna te ez wînda kirim bê hiş û bê sewdan kirim
 Şev û roja ez narazim te bê cih û bê war kirim
 Qîzkê kirim rengê pîra dilê min daye ber kêra
 Hingî li te digeriyam ez bûm hejar rengê pîra
 Camek şerbet tû bide min ji herdû lêvê xwe birjîne
 Qîzkê tiwî dilê min î tiwî rih û canê min î
 Tu ronîya mala minî tiwî xwîna dilê minî





Sernivîser
Qado Şêrîn

Rêvebirê Nivîsînê
Arşek Paravî

Desteya birêvebir


Pîr Rustem
Silêman Azer
Ezîz Xemcivîn

Derhener
Xorşîd Şûzî

Abdilbaqî Huseynî
Lawîn Şêxo

Ji bo hinartina berhemên kurdî: kurdi.penusanu@gmail.com

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**